


Bi gurbûna şer re, dewleta tirk jî berî dide şerê derûnî. Şûrkêşa vî şerî jî çapemeniya tirk e. Artêşa tirk bi destpêka biharê re, dest bi operasyonên mezin kir, lê li hemberî taktîkên gerîla destvala vedigere. Hejmara kuştî û birîndarên hêzên dewletê zêde dibe. Nexweşxane bi birîndaran mişt in, lewre jî deriyê wan jî kesên sivîl re hatiye girtin. Lê hê jî çapemeniya fermî, rûpelên xwe bi serkeftinên nîgaşî (sanal) dixemilîne. Li aliyekî tê gotin ku dawiya PKK'ê hatiye, li aliyê din jî tê gotin ku ev operasyona herî mezin a 14 salan e.

Rûpel -3



Şer gur dibe, derew pir dibin


Hevpeyvîna Medenî Ferho digel zimanzanê kurd Mustefa Reşîd: "Em bi xwe jî gunehkar in" Rûpel 8-9

Nirxandin-Ahmet İvrendi: Di lîstika şer de şewaza Tevera Azadiyê. Rûpel-6

Lêkolîn-Danasîn-Helîm Yûsiv: Dengê kurdên li Lubnanê: Sorgul. Rûpel- 4

Cejna Kedkarên Cîhanê 1 Gulan, pîroz be!

Azadiya **WELAT**



SAMI TAN

Awêneya civakê û desthilatdariya bîrdozî

Di nav tesbîten li ser çapemeniyê de gotina herî balkêş ev e: "Çapemenî awêneya civakê ye." Li gorî vê gotinê, çapemenî rewşa civakê nîşan dide, nikare wê rewşê bi awayekî din nîşan bide.

Heke mirov vê gotinê ji bo çapemeniya tirk jî, bi kar bîne, wê gavê bi rastî rewşeke kambax derdikeve pêşberî mirov.

Divê mirov lê hûr bibe, lewre ji bo ku mirov bigihêje encameke nêzî rastiye, pêwîstî bi lêhûrbûneke baldar heye. Ji ber ku encama vê nîrxandinê, wê dirûvê civaka tirk pêşkêşî me bike.

Wekî kesên ku bîr û baweriya xwe bi biratiya gelan tînin, dilê me tu car naxwaze ku em sûcê hovitiyên ku li welatê me pêk tên, bixin stûyê gelê tirk.

Lê hema di cih de çend rêzên helbesteke Nazim Hikmet, tînin bîra mirov, ew jî di helbesta xwe ya bi navê "Heyberê herî seyr ê gerdûnê" de, dibê-

je:

Dilê me naxwaze ku em bibêjin, sûc ê te ye,

Lê piraniya sûc ê te ye kekê min.

Gelo mirov dikare bibêje, rojeva gelê tirk û nûçeyên rojnameyên tirk ji sedî sed ji hev cûda ne. Dema rojnameyên tirk firaqan didin, mirov hêrs dibe û dide zanîn ku ew ji rojnamegeriyê dûr dikevin. Lê kesên ku ji bo çend firaqan ji serê sibê ve li ber deriyê cihê ku lê ev firaq tên belav kirin, dikevin dorê, ji bo dorê bi hev re şer dikin, serê hev dişikînin, vê kirina rojnameyên tirk teşwîq nakin gelo?

Demê mirov dibîne, daweta kesên mîna Hülya Aşar û Bülent Ersoy di piraniya rojname û televîzyonên tirkan de dibe nûçeya sereke, bivê nevwê mirov pê hêrs dibe. Lê gelo bi deh hezaran kesên ku van nûçeyan ji nêzik ve dişopînin, ji vê rewşê ne berpîrs in? Nûçegihaniya Reha Muhtar li gelek

civatan, dibe sedema henek û tinazan, lê dîsa jî di nav televîzyonan de herî zaf li nûçeyên Show TV tê temaşekirin.

Li hemberî hovitiyên ku li Kurdistanê pêk tên, hemû hestên mirovên hişyar ên mirovî serî hildidin. Tê zanîn ku ev kirinên ne mirovî bi destê artêşa tirk tên kirin. Lê anketên ku di nav gelê tirk de tên kirin, nîşan didin ku gelê tirk piranî hêviya xwe bi artêşê ve girêdaye, di nava saziyên xwe de bi piranî bi kirinên artêşê piştrast e.

Nexwe divê kes xwe nexapîne, çapemeniya tirk bi rastî jî, awêneya civaka tirk e. Li gorî rêzanên zanistî jî ev gotin di cihê xwe de ye. Tu hêz tenê bi zor û zilmê nikare li ser piyan bimîne. Digel ew qas zilm û zorê jî desthilatdariya dagirker û mêtîngeran a li ser gelê kurd ne mayende ye, lê heman tişt jî bo gelê tirk derbas nabe. Lewre bîrdoza mêtîngeran li ser gelê tirk desthilatdar e.

Tu hêz tenê bi zor
û zilmê nikare li ser piyan
bimîne. Digel ew qas zilm
û zorê jî desthilatdariya
dagirker û mêtîngeran a li
ser gelê kurd ne mayende
ye, lê heman tişt jî bo gelê
tirk derbas nabe.

Hêviya xewnan

Ferhengok

awêne: neynik, mirêk	loqat: piştî hasadê
bendixane: girtîgeh	komkirina bermahiyan
berz: bilind	mayende: herheyî
bexil: sirperest	nasnav: kimlik
binyat: esl, ata	nasname: kimlik kartî
binur: çakîl taşî	nîgaşî: xeyalî (sanal)
çavpêketin: hevpeyvîn	paçinkirin: sergirtin
oest: laş	perav: qerax, kevî
dahatin: hatin xwarê	pestan: zordarî, pest
darbest: tabût	pêpeskirin: ihlalkirin
daw hilgavtin: sir û	pişikdar: hevbeş, şirik
eyb derxistin	qawêr: çarçowe
desthilatdarî: serdestî	qedimîn: lênêzîkbûn
dexes: çavnebar	ramyar: siyasetmedar
diranê qot: diranê	ramyarî: siyasî
şkêstî	rêgez: prensîp
elende: berbang	rewîq: sinc, ehleq
elc: cureyekî bê	rêzan: rêpîvan, qeide
êl: eşîr	sebare: li ser, derbarê
ferxik: tiştê tîmehîştî	serdem: heyam
gerdûnî: cihanî,	serinc: bal, dêhn
evrensel	seyr: balkêş, ecêb
gulofik: firmêsk, hêstir	tali: dawî, paşîn
hevbeş: şirik, hevpar	tawan: sûc
heyam: serdem	teng: ast, sewiye
heyber: mahlûq	xemgîr: xemgîn, bi
hilawestin: dardekirin	keser
kator: tilik, şeh (ibik)	xwendegêh: dibistan
kil: pîvanekê zadan	xwerist: xweza, surîşt
lêbandin: dek û dolab	xweserî: cihêrengî
lawaz: qels, zeif	(özgün)

MEM BOTANÎ

Di pêşvebirina şerê kirêt de, ji nava dozê ketina kesayetiyan lawaz, hêviyên rengîn tîne hişê berpîrsiyarên wê sazûmanê. Ew, tim û tim li benda keysa xwe ne, da ku bikin mijara xewnên xwe û bi xwe bi zorê bidin bawerkirin. Di vê riyê de û ji bo vê armancê, zagonên ji rêzê jî nayê bîra wan. Çawa be ew xwedî-hêz in, dewlemend in.

Lewre di vê demê de ên ku zagonên hemdemiyê, merivbûnê bine bîra wan; ango, zagonên şer, ên divê pê ve girêdayî bimînin, bînin bîra wan, ew jî dibine dijmin, alîgirên gerîla.

Hela hela ku ûstek (hincet) jî bikeve destê wan, ew xwe winda dikin. Lewre jixwe piyên wan li hewa ye. Tu car jî negihîştîye erdê. Ma ji ber vê yekî nîn e, ku şerê kirêt dimeşînin?

Şexsiyeta biyan a ku di nava Tevgera Azadiyê de xwe neheline, çiqas xwe veşêre jî, rojekê her wê derkeve holê. Lewre lawaz û bê-nîrx e. Ji ber ku di şexsiyeta xwe de şerê azadbûnê bi serkeftinî nedaye meşandin, tîgîhên paşverû

ên dijmin di şexsiyeta xwe de parastine. Ji ber vê yekê rojekê bi diyarî jî ew xwe digihîne dijmin.

Em bi mînakeke wiha re li hemberî hev in. Şexsiyeta dijmin ku ji soresê dûr dikeve, dibe hêviya xwejiyandina kirêtiyê. Li dora kirêtiyê dide tîzikan. Ji wan tîrî qey xewnên wan rast dibin. Hiş û

Di rojên ku dorûberên me bi xewna hatin rapêçandin de em, bêhtir bi xurtbûna tîgîha sosyalîzma zanistî, bi hêviyên girseyî ya serkeftinê cejna kedkarên cîhanê 1 Gulanê pîroz dikin.

raman di serên wan de namîne, serxweş dibin, ji xwe ve diçin. Çavên wan êdî tişteki nabîne. Her tim pesnê xwe didin. Dixwazin herkes wan birastîne. Ev dem, dema wisa nazîkbûnê ye ku rexneyek tenê jî napejirîne. Hemû rexnegirên dewletê, wekî dijmin tên diyarkirin. Hinan diavêjin hepsê, hinan jî "kiryar nediyar" dikin.

Di vê demê de, li gorî ûsta ku ketiye destê wan, dîsa berpîrsiya-

rên dewletê xwe hildavêjin. Di hemû medyaya xwe de dîsa giraniya xwe dane ser şerê taybet. Dest bi dubarekirina teraneyên kevn kirine. Lê gavek berê jî, wekî ku siya wê dikete ser rojevê, xwe hinekî 'nêrm' didan xuyakirin. Li ser kêşeya kurd û çareserbûna vê pîrsgerêka neteweyî hinek hevpeyvîn, gengeşî dianîn rojevê. Gel li ser difikirî.

Lawaz xuya bike jî, rîya sekinandina şer û ûstên wê kifş dibûn. Lê bi wê xwe xapînoka paşîn ku ûstê didin nîşandan, piyên wan dîsa ji erdê qut bû. Dîsa ketin nava xewnerojkan. Çiqas xwe bi-xapînin jî wê rastiya wan bê diyarkirin. Lewre ev fermana dîrokê ye.

Di rojên ku dorûberên me bi xewna hatin rapêçandin de em, bêhtir bi xurtbûna tîgîha sosyalîzma zanistî, bi hêviyên girseyî ya serkeftinê cejna kedkarên cîhanê 1 Gulanê pîroz dikin. Bêguman ev pîrozbahî divê bi Tevgera Azadiyê, bi germahiya raperîna karêrên bajarê Chicago di 1886'an de biafire..

Wê gavê ew ê wekî şerê taybet hemû kirêti bînin şuştin û mirovahiyeke nû gul vede. Lewre bêhna wê sorgulê ji niha ve tê...

Şer gur dibe, derew pir dibin

Tevî ku hêzên dewletê ji operasyona Bestan destvala vegeîn, hê jî generalên tirk qala serkeftinan dikin. Li aliyê din êrîşên hêzên dewletê yên li ser saziyên demokratîk jî lez girtin. Li Stenbolê polisên tirk bi ser gelek saziyên çandî û navçeyên HADEP'ê de girtin û bi dehan kes xistin bin çavan.


Şerê psikolojîk ê ku bi xwespartina Şemdin Sakik dest pê kiribû, bi hemû gurehiya xwe didome. Çapemeniya tirk digel senaryoyên li ser Sakik, bi daxuyaniyên fermî yên li ser operasyonên li Bestan û sêgoşeya Amed, Çewlik û Mûşê serkeftinên nîgaşî bi dest dixin. Tevî ku hêzên dewletê ji operasyona Bestan destvala vegeîn, li vegeerê jî rastî kemîna gerilayan hatin û gelek xesar dîtin, hê jî generalên tirk qala serkeftinan dikin. Li gorî daxuyaniyên fermî ji sed gerilayên li herêma 89 heb hatine kuştin, fermanarê herêma Murat Karayilan bi zorê ji destê wan filitiye. Lê agahiyên xwecihî diselmînin ku bi tenê di êrîşeke gerîla de nêzî 30 leşkerî hatine kuştin, di nav pînc firoqe hatine xistin, di hemû operasyonan de bi tenê 15 gerilayan jiyana xwe ji dest dane. Di nav operasyonan dawîn a ku wekî operasyona herî mezin a 14 salan tê binavkirin de, heta niha balafireke şer ji aliyê gerilayan ve hatiye xistin, li ser windahiyan her du aliyan agahiyên tegez bi dest neketine.

Hefteya çûyî şerê psikolojîk li ser îfadeyên Şemdin Sakik hate meşandin. Li gorî çapemeniya fermî Sakik di îfadeya xwe de navê gelek saziyên welatparêz, partiyên siyasî, kesên rewşenbîr daye û diyar kiriye ku ew kes ji aliyê PKK'ê ve tîrî finansekirin. Di nav van saziyan de Ûlkede Gündem, Emek, Özgür Halk,

Öncü Yurtsever Gençlik, Özgür Kadın, Millî Gazete, Akit û NÇM cih digirin. Di nav gori îdiayan nivîskarên rojnameya Sabahê Cengiz Çandar û M. Ali Birand ji PKK'ê alîkarî girtine. Piştî van nûçeyan bi rojekê rojnameya Sabahê Cengiz Çandar û M. Ali Birand ji kar avêtin. Serokê Yekîtiya Rojnamegerên Tirkîyeyê Nail Güreli, ji kar avêtina her du nivîskarên şermezar kir û wekî înfazê bêdarizandin bi nav kir. Hinek kesên din piştevaniya Çandar û Birand kirin, li ser vê Cengiz Çandar ji nû ve dest bi nivîsandinê kir. Serokê Giştî yê İHD'ê Akın Birdal jî bû hedefa êrîşên çapemeniya tirk.

Êrîşên berî 1'ê Gulanê

Hefteya çûyî di rojevê de amadekariyên pîrozkirina Cejna Yekê Gulanê û beramberî vê yekê polisên hebûn. Li Stenbolê polisên tirk bi ser gelek saziyên çandî û navçeyên HADEP'ê de girtin û bi dehan kes xistin bin çavan. Ji van êrîşan yekemîn Navenda Çanda Mezopotamyayê roja 28'ê meha avrêlê para xwe stand û seat li 11.30'an nêzîkî 100 polîsî bi ser NÇM'ê de girt. Di encama vê êrîşê de pînc ji wan mêvan, 26 kes hatin binçavkirin. Di lêgerînê de hemû tiştên NÇM'ê ji aliyê polîsê şaxa terorê û polisên şaxa malî ve hatin serobinokirin. Gelek arşivên Beşa Sînema û şanoyê hatin desteserkin. Li gorî daxu-



Polîsên tirk girtin ser NÇM'ê jî û zêdeyî 4 saetan li hundir man. Piştî lêgerîna hundirê saziyê serobino babû.

yaniyan gelek pirtûk û nivîs jî ji aliyê polisyan ve hatin desteserkin. Piştî vê êrîşê daxuyaniyek ji aliyê NÇM'ê ve hate dayin û di daxuyaniyê de hate diyar kirin ku, ev bi salan e ku desthilatdaran ji êş û jan û tevkujîyan pêştir tu tişt layiqî gelê kurd nedîtiye. Li gorî agahiyên roja 29'ê avrêlê Serokê NÇM'ya Amedê Remzi Yıldırım jî hatiye binçavkirin.

Doza HADEP'ê

Piştî girtina Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Bozlak û rêveberan cara duyemîn roja 28'ê avrêlê 1998'an derketin pêşberî dadger. Di encama dadgehê de doza HADEP'îyan avêtin 28'ê gulana 1998'an. Sedema taloqkirinê jî wekî îfadeyên Şemdin Sakik hate nîşandayin. Berî ku doz dest pê bike, ji hemû hêlên Kurdistanê û Tirkîyeyê bi hezaran endamên HADEP'ê jî bo ku beşdarî dadgehê bibin çûne Enqereyê. Lê belê gelek kes bi êrîşa polisên Enqereyê hatin girtin. Di vê êrîşê de bi tevahî 192 kes hatin binçavkirin. Heyeta biyanî li ber dadgehê çalakî pêk anîn û li Gölbaşı, Polatlı û li

ser rîya Eskişehir gelek endamên HADEP'ê li ber gîşeyên otobanê hatin rawestandin. Piştî vê HADEP'a Stenbolê û Navenda Giştî daxuyaniyêke çapemeniyê weşand û ev kirin şermezar kirin.

Frisullo hate berdane

Dino Frisullo li Amedê di pîrozbahiyan Newrozê de hatibû girtin. Li gorî polisên tirk wî propogandaya PKK'ê kiribû. Lê belê Frisullo di doza xwe ya ku roja 28'ê avrêlê li DGM'ya Amedê dest pê kir de, serbest hate berdane. Frisullo di xweparastinê de diyar dikir ku, ew maxdur bûye. Piştî jî wî wiha got: "Ez ali-girê aşî û mafên mirovan im. Ez şpasdarê dewleta tirk im, ku ew fersend da min ku, ezê bikaribim îhlalên mafên mirovan belge bikim." Piştî ku Dino ji Amedê veqetiya, li balafirgeha Stenbolê jî çalakiya xwe domand. Ew bi qasî saetekê li balafirgehê ji aliyê polisyan ve hate sekinandin. Dino Frisullo li balafirgehê jî çalakiya xwe, çapemeniya tirk jî çêfiroşiya xwe domand.

NAVENDA NÛÇEYAN

Malbata Frisullo: Dîno piştevaniya hemû gelên bindest dike



Berî ku malbata Frisullo biçe Amedê em li Stenbolê bi jina Dino Frisullo Maria Grazia û xwişka wî axivîn.

Hûn girtina Dino çawa dinirxînin?

Donatella Frisullo (Xwişka wî): Em girtina Dîno huquqî nabînin. Frisullo şervanê aştiyê ye. Berî niha ji bo aştiyê çûbû Bosna û Filistinê.

Maria Grezia (Hevala wî): Mafên Dino nayên parastin. Rêzê nişanî ramanên cûda nadin.

Çapemeniya tirk Dino wekî provakator bi nav kir.

Hûn vê yekê çawa dinirxînin?

Donatella: Ji her aliyê ve diyar e ku, birayê min têkoşîna aştiyê dide. Dino, dema li Almaniyayê penaberên tirk bi destê faşîstan hatin kuştin, piştgiriya penaberên tirk jî kiribû, li dijî kuştina wan derketibû.

Wî, di nav rêxistina alîkariya ya bi navê Karîtas wekî rayedar kar kiriye. Ew bi tenê aştxwaz e. Lê her kes dizane ku Tirkîye ne dewleteke demokratîk e. Îşkenceyê li mirovan dike, mafê kurdan înkâr dike.

Dengê kurdên li Lubnanê: Sorgul

Di 5'ê gulana 1932'yan de biryar hat girtin ku, kurd tirkên çiyayî ne. Li ser vê yekê, gelek kurdan berê xwe dabûn Lubnanê. Van salên dawî bandora tevgera rizgariya gelê Kurdistan xwe berdabû nav wan, ligel avakirina piran bi xwendevan û rewşenbîrên ereb re Sorgulê dest bi weşanê kir.

HELÎM YUSIV

Dîroka kurdên li Lubnanê

Kovara Sorgul, li Beyrûdê bi zimanê erebî tê weşandin, heta niha li dora deh hejmaran hatiye weşandin. Kovar bi awayekî fermî û eşkere di nav kurdên Lubnanê de tê belavkirin, lê berî ku em axaftinên xebatkarên wê bixwînin, em ê hinekî, li gorî hejmarên pêncemîn a Sorgulê, li ser dîrok û rewşa kurdên Lubnanê rawestin. Hebûna kurdan li Lubnanê kevne. Destpêka hatina kurdan bo Lubnanê vedigere sedsala yazdehan, serdema Zengî û Eyûbiyan. Gelek ji malbatên êlên kurdan di nav koçberiya mezin a ku ji Bakur ber bi Başûr de çêbû, hatin Lubnanê. Di serdema Memlûkî û Osmanîyan de, ji sedsala şanzdemîn heta nava vê sedsalê û ji salên bîstan de piştî koçberiyên mezin pêk hatin. Bi deh hezaran kurd hatin Lubnanê û di nava vê civaka cur bi cur de çivakeke kurdî ji peyde bû. Li gorî dîroka civakî û siyasî tê xuyakirin ku gelek malbatên -ku bi esle xwe kurd in- roleke baş di dîroka vî welatî de bi cih anîne. Wekî Eyûbiyan neviyên Selehadîn (lawê Eyûb lawê Şadî) ye ku Nûredîn Zengî, sultanê Şamê (yê kurd) ew kiribû waliyê Bêelbek li deşta Biqa û di sala 1139'an de bûbû serokê wê parêzgeha wî cihî.

Di dema Selahedîn de û piştî wî ji gelek ji malbatên Eyûbiyan li Lubnanê bi cihbûn û ji malbatên kurdan yê kevne ev hene: Elmênîyûn-Sîva- ji kurdên Mûsilê malbata Îmad û ji kurdên Cizîra Botan, Meraiba yê ku di dawîya sedsala yazdehan de hatibûn Ekayê û li gundê Şêxcabir bi cih bûn û malbata Cinbilat (Canpûlat) û malbata Himye.

Lê di van demên dawî de ev malba-

tên kurdan, hema bi tevayî hatine bişaftin lê kurdên ku piştî cenga cihanê ya yekemîn (1914-1918) koç bûbûn, bûbûn wekî pira nav du serdeman. Ji hêlekê ve piştî 400 salî desthilatdariya Osmanîyan bi dawî bû û ji hêla din ve Fransî û îngilîz bûn xwedî desthilatdar û di wê navberê de Peymana Sifer (1919) li dar ket. Di bendên vê peymanê yê 62-63-64'an de bêhna Kurdistanê serbixwe -li bakur- jê dihat lê tevgera Mustefa Kemal bûbû bobelat ji bo gelê kurd. Her wiha Peymana Lozanê (1923) li dar ket û xewna serxwebûna kurdan jî têk çû. Bakurê Kurdistanê wan salan bûbû warê şoreş û serhildanan (1925-1930-1932-1937-1938). Lê Kemalîstan bi hovîti, barbarî, kuştin û koçkirinê, hêvî û daxwazên miletê kurd tarûmar kirin. Di 5 gulana 1932'yan de biryar hat girtin ku, kurd tirkên çiyayî ne. Bi vî awayî di bin bandora xerakirina mirovayeti û aboriya welêt de, gelek ji kurdan bûbûn koçber û berê xwe dabûn Lubnanê. Her wiha pêlên koçberiyê ew dabûn ber xwe û di wan riyên dirêj de hineka welat winda kir, hinekan jî welatê xwe di dilê xwe de av dida. Van salên dawî bandora Têvgera Rizgariya Gelê Kurdistanê xwe berdabû nav dilê wan û ji bo kurdperwerî û girêdana bi welat re xurtir bibe, ligel avakirina piran bi xwendevan û rewşenbîrên ereb re Sorgulê dest bi weşana xwe kir.

Lêpîrsîn li gel xebatkarên Kovara Sorgulê

Şahîn Raşîd: Kovar Sorgul ya lêkolîn-şîrovekirin-vepîrsîn, bi zimanê erebî tê weşandin lê bi taybetî li ser rewşa gelê kurdî disekine, bi armancê ku rasti-



ya civaka kurdî bigihîne xwendevanê erebî.

Ev kovar yek ji encamên pêşketina Têvgera Rizgariya Neteweya Kurdistanê ye. Û yek ji çapemeniya fermî ye -yên pir kêm- tê weşandin li navçeya erebî.

Hejmara (0) di 16-01-1996 bi îmkaneke piçûk û qels hate weşandin, lê hejmar bi hijmar hate pêşxistin ku niha gihiştîye hijmêra 9. Ta niha rola ku tê xwestin bi cih neaniye lê biryar ew e ku bi rol û bandora tê xwestin rabe û hêvî heye ku, bibe dengê rewşenbîrên kurd, ereb û ermen di pêşerojê de.

1500 hejmar tê çapkirin. 600 hejmar li Lubnanê tê belavkirin. Hejmarên din li welatê ereban û Ewropayê bi rengê abone tê belavkirin.

Biryar Xemgîn: "Ji bo çî dameziran-dina Kovara Sorgul? Dema ku doza kurdî bi pêş ket û bû xwediyê bandoreke girîng li ser cihanê, pir pêwîst bû ku doza kurdî rêflaksiyona xwe bike li ser holên erebî wekî tirkî û Ewropa.

Ji ber ku di welatên ereban de demokratî kêm e. Tu derfetên weşandina kovareke kurdan bi zimanê erebî tunebû. Lê li ser Lubnanê tê gotin: Komara çandê û çapemeniyê ye." Ji ber demokratîya wê, komek ji rewşenbîran dikaribûn kovara Sorgulê, bi armanca gihandina pirsê kurdî bo kurdan û erebên li navçeya erebî damezrînin. Bi nêrîneke rast û derxistina pirsên kurdî ji destên kurdên bazargan, niha mirov dikare bibêje ku Sorgul, tevî kêmasiyên xwe, xwedî hêzekê ya bi bandor e li hola erebî."

Ji aloziyên Sorgulê yek ji tengbûna pêgeha belavkirinê ye. Ji ber ku rêjîmên ereban ne tenê çapemeniya kurdî qedexê dike, kesayetiya kurdî jî qedexê dike. Astenga duwemîn, kêmbûna nivîskaran

e. Ev encam û bandora dide ser derengxistina kovarê. Bi riya Rojnameya Azadiya Welat em bang li hemû rewşenbîran dikin ku ji bo Sorgulê binivîsin. Rê vekirî ye ji bo eşkerekirina hemû pirsên kurdî û gihandina rastiyê ji raya gellemperî re.

Wîjdan Dêrîkî: "Gel bi xwe çand e; gel dibistana rewşenbîran e. Her wiha felsefeya kurdan felsefa jiyane ye, tewriya pratîkê ye. Lê di serdema sedsaliya nû de (şerê informasyon û elektronê) têra mirovê kurd nake û dibê tev aliyê tewrî bibe ya cur bi cur.

Ango: "Dibistana jiyane tevî dibistana pirtûkan bike." Dema insanê kurd bikaribe bibe xwediyê felsefa jiyane, tev felsefeya tewrî, wê çaxê dikare xwe bigihîne deriyên serdemê.

Kovara Sorgul, li gorî destûrên û statuyên fransî kar dike, rêza mafê çandî ji kurdan dike û tu berbendan li hemberî nivîsandin û weşandina nivîsan daneyne. Dema ku azadî hebit çand û raman pê re vedijîne û ev pirsê bandor û reflaksiyona xwe bi rengêki postîf, li ser pêşketina karê me dike.

Nama Sorgulê gihandina, hin hêlên ji civakê kurdî (ramyarî, çandî, dîrokî) ji xwendevanê zimanê erebî re.

Çiqas gelên ereb-kurd bi hev re jiyane lê hin ereban rastiya pirsên kurdan nas nekirine. Minaka Selahîdînê Kurdî û Mîrê helbestvanên ereban Ehmed Şewqî (û bi sedan wekî wan...) erebî wan wekî kesên ereb dinasin. Yek ji armancên Sorgulê ev e ku wan kesan bide nasîn. Mirov nikare nimûneyan bide ser rewşenbîr û ramyarên ereban ku, bi mafê kurdan re di jiyana azad de piştigiriyê dike. (ji bilî yek yan du).

Soza me ew e ku, dema ku derfetê be li pêş Sorgulê, em bi zimanê kurdî bixwînin û binivîsin.

Rêzimanê kurmancî

SAMÎ BERBANG

- Wane 9 -

Cînavk

Her wekî ji wateya peyvê jî tê fêmkirin, cînavk di nava hevokê de cihê navdêran digirin, ji ber vê yekê jê re cînavk hatiye gotin. Pêşî divê mirov li ser taybetiyên giştî yê cînavkan hinekî raweste. Piraniya taybetiyên navdêran ji bo cînavkan jî derbas dibin.

Di cînavkan de jî zayend, mêjer, tewang heye. Li gorî rola ku digirin ser xwe, hinek guherîn di cînavkan de jî pêk tên, ango ditewin. Li gorî navdêran ku cihê wan digirin, cînavk jî an nêr an mê, an jî nêtar in. Her wiha li gorî navdêran ku cihê xwe didinê, cînavk jî yekjimar an jî pirjimar in. Dîsa di nava hevokê de, cînavkek an kirde yan jî bireser e. Mirov vê rewşê dikare bi çend mînakên destnîşan bike.

Li gorî peywira ku digirin ser xwe cînavk:

Di hevoka "Min ew dît" de *min*, kirde, ew bireser e.

Di hevoka "Ez wê/wî dibînim" de *icar*, *ez* kirde û *wî/wê* bireser e.

Li gorî zayendê cînavk:

Nêr: *Wî*, *vî*,

Mê: *Wê*, *vê*

Nêtar: *Ew*, *ev*, *ez*, *tu*...

Li gorî mêjerê cînavk:

Yekjimar: *Vî*, *vê*, *wî*, *wê*, *ez*, *tu*, *yek*

Pirjimar: *Van*, *wan*, *em*, *hûn*, *hin*
Mêjera cînavkên "Ev, ew" ji cînavkên pêrebestî tê fêmkirin.

Bo nimûne, dema yek bibêje: "Ew/ev ji welêt hat", tê zanîn ku ew her du cînavk yekjimar in, lê dema mirov bibêje: "Ew/ev ji welêt hatin" wê demê diyar dibe ku, ew her du cînavk pirjimar in.

Ji aliyê tewangê ve cînavk:

xwerû: *Ez*, *tu*, *ew*, *ev*, *kî*

Tewandî: *Min*, *te*, *wî*, *wê*, *wan*, *van*, *kê* yekî/yekê, *hinekan*...

Piştî van agahiyên giştî, mirov dikare derbasî mijara, cureyên cînavkan bibe.

Bi tomerî şeş celeb cînavk hene:

- 1-Cînavkên kesane
- 2-Cînavkên şanîdanê
- 3-Cînavkên pirsyarî
- 4-Cînavkên nebinavkirî

5-Cînavkên girêkî

6-Cînavkên xweditiyê

Cînavkên kesane

Mijara herî berfireh, cînavkên kesane ne. Cînavkên kesane, di nava xwe de dibe çend bir. Pêşî mirov dikare cînavkên kesane bike du bir, kirde û bireser ango xwerû û tewandî:

Xwerû Tewandî

Ez Min

Tu Te

Ew Wî/wê

Em Me

Hûn We

Ew Wan

Di nav van de "Ez, tu, ew" cihê navdêran xwe yê yekjimar digirin, lê "Em, hûn, ew" cihê navdêran xwerû yê yekjimar digirin. Li aliyê din, cînavkên "Min, te, wî/wê" cihê navdêran tewandî yê yekjimar, "Me, we, wan" jî cihê navdêran tewandî yê pirjimar digire.

Li ser vê mijarê mirov dişê çend mînakên bide.

Ez te nas nakim

Tu min nas nakî

Ew wan nas nake

Hûn me nas nakin

Em wî/wê nas nakin

Di van mînakên de lêker gerguhêz e û dem jî dema niha ye, lewre kirde xwerû, bireser tewandî ye. Heke mirov hinek navdêran bixe cihê wan, ewê jî heman dirûvî bigirin.

Bo nimûne:

Elî şivên (şivanî) nas nake

Elî şivanan nas nake

Şivan gundiyan nas nake

Şivan Xezalê nas nake

Gundî qerêş (qeraşî) nas nakin

Her wekî me berê jî dabû xuyakirin, di demên niha û bê de kirde xwerû, lê bireser tewandî ye, lê di hevokên ku lêkerên wan gerguhêz û dem jî demên borî ne de, îcar kirde tewandî, bireser xwerû ye. Heke em heman hevokê di dema borî dê binivîsin, de cihê cînavkan jî biguhere.

Min tu nas nekirî

Te ez nas nekirim

Wî/wê ew nas nekirin

We em nas nekirin

Me ew nas kir

Ger em kesan bixin cihê wan cînavkan, ew jî dê li gorî wê teşe bigirin.

Elî (Eliyî) şivan nas nekir

Elî (Eliyî) şivan nas nekirin

Şivên (şivanî) gundî nas nekirin

Şivên (şivanî) Xezal nas nekir

Gundiyan qeraş nas nekir

Cejna Derewan

NEJDET BULDAN



Dewleta tirk li kuderê pêpeskirina mafekî kiribît, an zagoneke parastinê li ser wê babetê çêkiriye an saziyek li ser parastina wê ava kiriye an jî her dem li ser parastina gelek mafan zagon çêkiriye. Peymanên navneteweyî îmze kirine. Lê belê ew bi cih neanîn.

Hemû peymanên ku mafê mirovan û gelan diparêzin, bi destê rayedarên dewletê hatine îmzekirin: Zagona Bingehîn ya Neteweyên Yekbûyî, Mercên AÇİT'ê, Mercên AÇİK ê û hemû peymanên navneteweyî.

Gelek zagonên dewleta tirk jî li ser parastineke demokratîkî hatine damezirandin. Di zagonên xwe de mafê mirovan diparêz e. Lê belê ew parastin û zagon, ji bo gelê kurd û wan ramanên ku mafên gelê kurd diparêzin, nîn e.

Zagonên parastina mafên karkeran, zagonên parastina nûçegihaniyê, parastina çapemeniyê. Her wiha li ser parastina hemû

mafan zagon hene. Lê belê pêkanîn bi piranî çinîn e.

Her sal rojek ji bo mafê mirovan e. Lê belê êdî dinya hemû dizanît ku, pêpeskirina mafê mirovan li Tirkiyeyê bûye parçeyekî jiyana rojane. Zulm û zoriya di wê rojê de li kurdan tê kirin êdî tiştêkî veşartî nîn e.

Çend rojan berî niha li cihanê roja mafên jinan bû. Lê medît dewleta tirk çiqas hurmeta jinên kurd girt! Dîsa çend rojan berî niha cejna Newrozê, wekî fermî bû Nevrûz. Lê dîsa hemû cihanê dît ku, cejna fermî û cejna gelê kurd jêk (jihev) cuda bû. Di Nevrûzê de keniyeke sexte hebû. Di Newrozê de jî xwîn û şahî bi hev re bûn.

Ew mînakana bi hezaran hene.

Gotina me li ser cejna 23'ê avrêlê ye. Çi cejn e, çi hal e? Cejna derewan e. Lêbandineke navneteweyî ye. Sextekariyê mezîn e. Li aliyekî bi milyonan zarokên kurd koçber in, bê xwendin û perwerde ne. Li sergoyan li xwarinan digerin. Bi hezaran zarok bi destûra dewleta tirk hatine sêwîkirin. Zimanê wan, çand û kultura wan qedexeyê. Hebûn û navên wan jî qedexeyê. Deşt û çiyayên wan, gund û bajarên wan hatine şewitandin. Jiyana wan di talûkê de ye. Ew ên diçin dibistanan jî bi derew û nijadperestiya şovenîzmê tî perwerdekirin. Dayik û

bavên gelek ji wan di zîndanên de ne. Bira û xwişkên wan an girtî ne an kuştî ne, an jî revîne welatên xerîbiyê.

Zarokên kurdan. An di welatê xwe de bindest in an jî di welatên xelkê de penaber in.

Salvegera vebûna meclîsa tirkan ji zarokên tirkan re cejn e. Gelek zarokên cihanê jî beşdarî pîrozkirina wê cejnê dibin. Dewleta tirk jî pesna xwe didet. Wekî mafparêzekî zarokan xwe didete naskirin. Em di çapemeniyê de dixwînin ku, saziyek kurdan jî xwestiyê beşdariyê di wan pîrozbahiyên de biketin. Lê belê rayedarên dewletê ev daxwaz red kirine. Bi dîtina min, rayedarên tirk neheqî li saziyê kurdan nekiriye. Qenciyeke gelek mezin, li wê saziya me hatiye kirin. Zarokên kurdan nebûne pişikdarên sextekariyê. Meclîsa tirkan ji kurdan re (ji kurdên welatparêz re) qedexeyê. Biryarên asîmîlasyon û qirkirina zarokên me, ji wê meclîsê derdikevin. Nûnerên kurdan jî wê meclîsê hatin derxistin. Roja ew meclîs hatiye damezirandin, destpêka înkâr û qirkirina neteweya kurd e.

Bila zarokên kurdan xemgîr nebin û li ber xwe bidin. Roj tê ew jî dê cejn û salvegerên xwe bi serbilindî pîroz bikin. Lê belê pewîst e ku dîroka xwe û dijmin jî baş nas bikin.

Di lîstika şer de şewaza Tevgera Azadiyê

Di Rojhilata Navîn de jiyîn an meşandina polîtîkayê, pêşiya pêşîn divê mirov bi hêz be. Hêz bi şer çêdibe. Şer jî hêza artêşê dixwaze. PKK hem xwediyê qewetê mezin e û hem jî xwediyê artêşê ye. Bi hêza xwe bandorê dide ser hemû hêzên navneteweyî.



Tevgera Azadiyê şer bi şarezayî dimeşîne. Mantîqê vî şerî ne tenê li ser aloziya leşkerî ye. Her wiha vî şerî li warê ramyarî, bîrdozî û heyânî psîkolojiya kesên jî, bandoreke mezin kiriye û PKK tecrûbeyên şer yê bi salan, di nav şerekî de bi cih kiriye û bi çêşeke mezin ber bi serkeftinê ve dimeşe.

Bandora şer tevî civaka kurd, li ser dost û dijminan jî berbiçav e. Her kes pê eleqedar e. Her kes dikare xwe di vî şerî de bibîne. Li gorî pêşketina şer cihê xwe kifş dike. Lewre PKK lîstika şer bi hunermendî dilîze. Sedemê bandora wê ku li ser her kesî heye, ev e.

Di naveroka lîstika şer de ramyarî, bîrdozî, afirandina polîtîk, hostahiya taktîkî, fersendî, nêzîkahiya îmkanan bi nermî an hişkî xapandina dijmin û hwd. giştî tê bikaranîn. Bi kinahî serkeftina di şer de, bi pêkanîna van qeideyan ve girêdayî ye. Tê zanîn ku di jiyânê de, gelek lîstikên gel an yê zarokan hene. Her yek bi awayekî tîn lîstin û tev jî qeide, qurnazî, xapandin û hunermendiyê dixwazin. Xweseriya wan jî hev cuda ye. Şer bi destpêk, pêşketin û encama xwe dişibe lîstikan. Lê tu lîstik bi qasî şer karîger, xeraker an jî avakar nîn e. Di lîstikên gel an yê zarokan de mirov baş nelîze an jî wî wînd bike di encamê de zor û zehmetiya jiyânê demakeve holê. Bandora şer di wê gavê de tenê xwe dide der. Ku lîstik diqede her kes diçe karê xwe û jiyana

xwe didomîne. Lê belê lîstika şer ne wisa ye. Şer lîstika zaroka nîn e. Şer bi qeideyên pir tûj û dijwar tê meşandin. Yê ku di vî warî de wînd bike her tiştê wî jî dest derdikeve, yê ku bi ser bikeve tiştê ku wînd kiriye tev bi dest dixê. Ger encam serkeftin be, wê demê şer dikare gelek tiştên nû bide avakirin û jiyaneke nû an afirandina şaristanîyê bi xwe re bîne. Ev her du encam jî dide xuyakirin ku, lîstika şer ji aliyekî ve zor, zehmetî, wêrankirin, şîn û girîn e, ji aliyê din ve jî afirandin e, jiyân e, serxwebûn û azadî ye, dayika felatê ye.

Serok ji bo vî lîstikê dibêje "Lîstika agir". Belê, agir germ e, mirov bizanibe bixebitîne jiyânê hêsan dike; lê çewt nêzîk bibe wê demê mirovan dişewitîne. Gerek e mirov lîstikvanê vî lîstikê be. Regeza wê ya herî girîng ew e ku, çewtî an kêmasiyan efû nake. Qeideya şer a bîngêhîn jî ev e ku "yên ku bi ser nekin wînd dikin". Xelekên din giştî bi vî ve girêdayî ne. Her tişt li dora vî qeideyê digere, dişixulîne û diji.

Di Rojhilata Navîn de qeideyên lîstika şer ji deverên din cuda ne. "qeideyên gur" tê gotin ji vî lîstikê re. Ji ber ku herêm di hêla stratejîk de, dîrokî û civakî de

xweser e. Li tu derê cihanê nakokî ewqas tevlihev û xedar nîn in. Li vî herêmê her lîstikvanek wekî gur e. Ji bo gepek baş bi dest bixê amade ne û li sifra xwarinê civiyane. Di qeideyê gur de merhemet tune ye, kîjan bikeve wînd dike û ji yê din re dibe xwarin. Yê lawaz be, nikare xwe biparêze û di nav lepê yê xurt de zû bi zû ji hev belawela dibe. Gurê li sifra civiyane birçî ne û di çavê wan de çikê agir dibare, devê wan bi xwîn e. Her yek di kemîne de, li benda yê din e. Ewlehiyê an jî dostayîyê bêdawî nîn e li ser vî sifra. Ji bo ku tu ji gurê birçî re nebe xwarin, divê berê tu tiştên li ser sifra nas bikî, paşê jî qeweta xwe bizanibî. Dîsa ji bo ku bikaribe xwe biparêze, divê ji wan guran zêdetir bêmerhemet, jêhatî, bi cesaret û xwedîti ji qeideyên dijwar re were kirin. Gerek e ku mirov xwedî hêzeke mezin be. Ji bo serkeftinê gerek e ku mirov van guran berê hev û du bide. Dubendiya têxe nava wan. Aliyên wan yê lawaz û xurt, pêwîst e, bê zanîn. Ji bo xerakirina lîstika guran merca yekemîn, bi her awayî naskirina guran e.

Di sifra guran de polîtîkaya PKK'ê hunermendî ye û serkeftin e.

PKK vî sifra pir baş dizane. Guran nas dike. Di Rojhilata Navîn de jiyîn an meşandina polîtîkayê, pêşiya pêşîn divê mirov bi hêz be. Hêz bi şer çêdibe. Şer jî hêza artêşê dixwaze. PKK hem xwediyê qewetê mezin e û hem jî xwediyê artêşê ye. Bi hêza xwe bandorê dide ser hemû hêzên navneteweyî. Êdî împeryalist, kevneperest û hevkarê wan, dema tesîra polîtîkayên PKK'ê nedin ber çavên xwe nikarin gawekê biavêjin.

PKK bi îdeolojiya xwe ya tîr zanistî, bi polîtîkayên xwe, bi şerê xwe di Rojhilata Navîn de xwe bi her kesî daye peji-randin. Êdî hêzên herêmê li gorî PKK'ê polîtîkayê xwe kifş dikin û li hev dicivin. PKK ji bo parastina berjewendiyên

mirovahiyê li ser vî sifra şer dimeşîne. Şerê rûmeta mirovahiyê dike. Tiştên ku dagirkeran, kevneperest û hwd. dest daye ser, PKK bi şerê xwe wan şûn ve distîne. Ji bo vî yekê, awayê şerê PKK'ê bi lez e, mezin e û balkêş e. PKK di vî şerî de her tişt li gorî serkeftina maweya kin, navîn û demdirêj amade kiriye. Ji bo serfiraziyê, armanc daye pêş xwe û bi wê ve girêdayî ye. Ev şewaz kedkarî û xebateke mezin e. Ji bo ku ji guran re nebe xwarin dilxwazên wê giştî bi awayekî bêhempa dixebitin. Bêyî vî şeweyê şer, cihê ku tu jiyân lê nemaye wê derê najî her tiştî ji nû ve nayê afirandin. Ji bo van sedeman PKK di cihê xwe da nasekine, her dem bi pêş ve dimeşe û hilpîşkîna pêk tîne. Meşa wê dijmin li pey xwe dihêle.

Şewaza PKK'ê sekîne naperjirîne, her dem nakokiyên dide şerkin û ev şer bêdawî ye. Lewra sekîna tîkçûn e, ji guran re xwarin e di vî erdnîgariyê de. Li ser sifra guran pêwîst e ku çav rind bibîne, diran tûj be û her dem meş bêsekin be. PKK'ê di vî lîstika şer de cihê xwe bi awayekî seranser, bêmecal an jî bêcesaret nagire; bi awayekî xurt, bi moral, bixwebawer û bi cesaretê mezin cih digere û bi hunermendî mercên lîstikê bi cih tîne. Şewaza wê wekî civayê ye. Her dem diherike. Çavê wê her dem li lûtkeyê (zîrve) ye. Şewaza xwe li gorî vî zîrveyê saz dike. PKK bi vî şewaza xwe dema li hevalbendê dagirkeran dixê deng ji dagirkeran tê, li dagirkeran dixê qêrînî ji împeryalistan, siyonîzm û xayinan tê. Ji ber ku PKK cihê ku lêxe baş dizane. Kengê, li kû derê, bi çi awayî, bi kîjan şeweyî lêdan pêwîst be, PKK bi vî awayî lêdixê û her dem bi ser dikeve.

Di Rojhilata Navîn de, li ser sifra guran tiştê ji PKK'ê re serkeftinê tîne, wê dike ronahiya mirovahiyê ev tarzê hanê ye.

AHMET İVRENDİ



Tevfik Sincar

Dîsa
Stêrkek şewitî ji
zeviya jiyânê
Stêrkek navsale
Stêrkek geş
li dûroniya wê
û ronahiyê hat
xwe li nav dil danî
dilê me pê serefiraz.

Li ser navê navê welatparêzên
Beldeya Yalım a Mêrdînî
yên li Stenbolê

KAHRAMAN ALAK

□ 5 Gulana 1987

Li diji kurdan "Qanûna Mecbûrî İskan" hate ragihandin.

Dewleta Tirk, piştî serhildan û têkçûna Serhildana Çiyayê Agiriyê, bi navê "Mecbûrî İskan" qanûnek ji bo kurdan derxist. Armanca vê qanûnê, ji hev belavkirin û pelîşandina eşîrên kurdan bû. Her wiha bi derxistina vê qanûnê dewleta tirk dixwest ku, rê li ber serhildanên kurdan bigire, kurdan ji herêmên kurdan derxe û Tirkmenan li herêmê bi cih bike.

BÛYERINE JI DÎROKÊ



□ 6 Gulana 1972:

Deniz Gezmiş û hevalên wî hatin hilawestîn

Ji rêberên THKO'yê Deniz Gezmiş, Hüseyin İnan û Yusuf Aslan, bêyî ku li diji dewleta tirk guleyek ji teqandibin, hatin daleqandin. Ew di rojên 18 û 24'ê adara 1971'ê li Sêwazê hatin girtin. Salekê di Girtîgeha Mamakê bi ser Enqereyê de man û şeva 6'ê gulana 1972'yan li Enqereyê ji aliyê Komara Tirkiyeyê ve hatin darvekirin.

Li Tirkiyeyê kûçik ji mirovan bi rûmetir in



Dek û dolabên şerê psîkolojîk, piştî girtina Şemdin Sakîk, dane navê. Dewleta tirk bi riya xapemeniya xwe ya virker û pekîner, lêsor bûye ku tevgera kurd wekî marjînal bide xuyakirin. Ev yek ji aliyê sazî û dezgehên demokratîk ve wekî 'dijminatîya gelan' tê binavkirin. Piştî bûyera Antalya, Çewlik, Amed û Hatayê ev kirin ji dijminatîya gelan hê wêrdtir çû, êdî wekî dijminatîya mirovatîyê tê dîtin. Ev karên kirêt, ji aliyê çapemeniya welatparêz û sosyalîst ve wiha hate nirxandin: "Etilka rojnamegeriyê ji aliyê medya tirk ve hate binpêkirin. Êdî ev ne rojname ne. Ew di bin fermandariya artêşa mirovkuj de, fermanber in."

Xapemeniya tirk, normên etîka rojnamegeriya navneteweyî ji binpê kirin. Nûçeyên di medyaya dewleta tirk de tîn weşandin, ji dêvla ku gel agahdar bikin, gelê kurd û tirk berdide hevûdin. Diyar e, çapemeniya tirk ji bilî militarîzmê, dixwaze hestên şoven ê gelê tirk gur û har bike. Bêguman gel ji reaksiyona xwe ya li diji vê nêzîkedayîna şerê psîkolojîk, nişan da. Lê dîsa jî ew wekî gurên har dev ji hovitiyê bernadin. Bûyera herî dilsotîner jî, piştî ku sê şervanên ARGK'ê li Antalyayê kuştin pêk hat. Cendekê wan ji aliyê xapemeniyê ve hatin teşhîrkirin û bi piştigirîya çend kesên gurperestan, ew cenazeyên gerilayan ji cihê ku hatibûn veşartin, bi kepçeyan hatin derxistin û li cihêkî din hatin veşartin. Balkêş e ku ew şervanên ARGK'ê 3-4 caran li ber çavên gelê Tirkiyeyê ji bin erdê, bi kepçeyan hatin derxistin û dîsa hatin veşartin. Lê belê deng ji tu kesî demeket. Li aliyê din, dilê gelê kurd bi vê yekê êşîya û reaksiyona xwe li hemberî vê kirinê nişan da.

Li aliyê din, di 22'yê meha avrêlê sala 1998'an li İskenderûnê kûçikek ji aliyê hin zarokan ve tê jehrîkirin. Piştê yekê karkerên paqîjiyê ew xistin nav erebeya sergoya bi pest. Li vir kûçik hate perçiqandin û mir. Piştî ku ev dîmen ji aliyê 'İhlas Haber Ajansı' ve hate kişandin û di xapemeniya virker û pekîner de hate weşandin, wekî "bûyera salê" hate bi nav kirin û bi dehan caran ew dîmen hate pîrbarekirin. Xapemeniya tirk ji bo ku bûyerên din yanî wahşeta xwe veşêre, li ser hestên mirovan keysperestiyê dîke.

Lê dubendiya helwesta civaka tirk a li hemberî her du bûyeran dide zanîn ku şerê qirêjî civaka tirk, her diçe ji pîvanên mirovahiyê dûr dixê. Lewre li Antalyayê mirov bi kepçeyan ji bin erdê, bi awayekî hovane hatibûn derxistin, can û rehê tu kesekî pê jan nedabû. Heftêyekê ew şervanên PKK'ê beramberî kirinên nemirovane man, kesî dengê xwe nekîr. Lê ji bo wî kûçikî "Serokê Diyanet İşleri" M. Nuri Yılmaz ji bo çapemeniyê "fetwayeke taybet" da.

Her wekî ji her kesî re nas e, rêzgirtina ji bo termên mirovan, di hêmu dînan de, di nav pîrozîrîn nîrxan de cih digirin. Lê oldarên tirk û saziyên oldar deng ji xwe neanin.

Li aliyê din dema ev bûyer diqewimîn Serkaniya Giştî ya Artêşa Tirk, li Enqereyê li ser şerê li diji Kurdistaniyan pêşangehek li dar xist û mirovperweriya mehmetçîk nişanî hemû cihanê da. Der barê mirovperweriya mehmetçîk de çîrokên hêstirbarîner hatin vegotin. Xapemeniyê ev pêşangeh bi awayekî berfireh pêşkeşî gel kir û bangawaziya piştevaniya mehmetçîk hate kirin.

AZAD AVAŞIN

ÇAVDÊRÎ



Hemû gelên Mezrobotanê bira ne

SERKAN BRÛSK

Kurdistan. Welatê me hemûyan. Welatê mezrobotîyan. Welatê axhezan. Welatê Bîrahîm. Welatê pêxemberan. Welatê Nemrût. Welatê Dehaq û Kawayan. Welatê nijadên kevnar. Welatê ol û mezheban. Welatê Zerdeşt.

Navika cîhanê. Kaniya mirovahiyê. Destpêka jiyane. Zozanê Nuh. Dayika Cudî ya bilind ku ewr li serê wî dibin du perçe û serê wî digihêje ezmanê heftan, ku tu carî serê xwe li ber zordan û kedxwaran netewandîye û dê netewîne.

Belê, hemû dîroknas qebûl dikin ku, welatê me yek ji warên herî kevnare yê cîhanê ye. Li Ewropayê, hin lêkolînên vî dawiyê, ku li ser xwîne hatine çêkirin, nişan didin ku mirovê ewil li Afrîkayê peyda bûye. Piştî demeke kin ew derbasî Mezrobotan bûne. Yê mane mane, yê din jî ji wir li hemû cîhanê belav bûne.

Mirovahiyê di navbera çemên Ferat û Dîjle de ji wê rojê heta niha gelek nijadên cuda ji xwe zêde kirin û vî xaka bêrdar jî, pîrîkiya gelek neteweyên nû kir û meytê gelekên jî di xwe de veşart. Bi qasî ku mirin û jiyana li vir ji bo gelan têkilî hev bûne, li cihêkî din nebûye.


Hemû gelên kevn yê vî herêmê, ji bo serdestî li hev û li xweristê bikin, têkoşiyane. Car hatiye bi ser ketine û car hatiye bi bin ketine. Binketiyana ji bo serkeftinê li pêş, nav di xwe dane û dema roja wan hatiye bi ser ketine. Çerxa Mezopotamyayê wiha geriyaye.

Ez ne dîroknas im. Bêguman ez naxwazim zêde tiliya xwe tîxim nav karê wan lêkolîneran, lê hinek aliyên dîroka Mezrobotanê min eleqedar dikin. Ez ku hemwelatî û kurdekî Kurdistanê me, divê gelên ku li ser vî erdnîgariyê jiyane nas bikim. Ez dibêjim, hemû kesên kurd û ne kurd, divê dîroka vî cografyayê baş bînin hişê xwe û xwedî li aliyê vî dîrokê yê baş û nebaş dervekin. Dîrok li ser vî erdnîgariya, bi aliyên xwe yê baş û nebaş hatiye jiyandin. Ger em hemû gelên vî herêmê bikaribin hev li ser rastiyên dîrokê hembêz bikin, em dê riya jiyaneke xweş vekin. Ji bo ku em ji niha ve pêşerojê xweş û wekhev ava bikin, divê tîkiliyên me bi hev re xurt û li ser bîngeha biratî û wekhevîyê bin.

Dewleta tirk ku qesasê biratiyê ye, bi hemû derfet û hêza xwe dibê bend, li pêşîya vî pêşketinê. Jixwe roja ku ew hatine vî deverê, wan ji xwe re tunekirina gelan esas girtine. Berî osmaniyan û piştî osmaniyan ev politîka meşandine. Mirov dikare navê gelek gelên ku hebûna wan bi hatina tirkan re, li vî herêmê ketiye xetereyê û heta jî holê jî hatine rakirin bide. Jixwe ev prosesa berî avakirina komara tirk digihêje radeya herî bilind. Ji 1915'an û pê de, êdî qirkirinê fiilî û asimilasyoni dibin politîkaya desthilatdarên tirkan. Ew dixwazin li vî herêmê tenê bijîn. Vê yekê heta tevgera duyemîn ya nuh, ku vî carê di 14'ê gelawêja 1984'an de pêk hat, bê ku tu dijîtiyekî xurt li hemberî xwe bibîne, dom kiribû. Piştî peydabûna şervanên azadiyê roja gelan jî hilat. Dengê Aramê Tigran hîn zelaltir û xweştir derket. Dengê hemû gelên vî herêmê her roja ku diçe xurtir dibê.

Înstîtuya Kurdî ya li Stockholmê ji bo alkariya vî tevgera nû bike, di nav hewldanekê de ye. Em dibêjin eyankirina 23'ê avrêlê wekî roja zarokên cîhanê, dê kuştina zarokên di zikê dayikên gelên Mezrobotan û Anatoliyê de nede jibîrkirin û ev roj dê tîra nixumandina tawanên wan neke û dê ew roj di bin siya tevkujiya 24'ê avrêlê de bimîne.

Zimanzan Mustefa Reşîd, Em bi xwe jî gu



HEVPEYVÎN: MEDENÎ FERHO

wa hîn bibin? Divêt hevaleyê ji me, xwe bo karê mamostetiye amade bike.

Ev karê hanê bû para min. Çi pirtûkên kurd wê demê bi dest min ketin, min xwendin. Ji Hawarê bigire heya pirtûkên Bedirxanan, yên li ser zimên, heya Qenatê Kurdo, Reşîdê Kurd û hwd. min xwendin. Ez gelek bi firehî li ser Hawarê rawestiyam û belkî min ew hêra. Pir caran ez heya paş nivê şevê dimam û min serincên xwe dinivîsandin.

Pêşî, di sala 1977'an de, min di komika me de waneyên (dersên) zimane kurdî dan. Ji 1978'an heya 1979'an li komeleyeke karkeran û ji sala 1979'an heya 1985'an, bi awayekî fermî li xwendegeha gelêrî ya bilind, li bajarê Berlîna Rojava, min karê mamostetiya zimane kurdî berdewam kir.

Êdî her tiştekî me bi zimane kurdî bû. Kovarên me, belavokên me, rêbaz, destûr û biryarên me her bi kurdî bûn. Tevî ku me dizanî bi vî awayî dengê me nagihê pir kesan jî û bandora karê me jî wisa kêmbê, lê dîsan jî, em bi rastiya xebe ta xwe bawer bûn. Me di wan salan de, gelek belavok, kovar û weşanên din yê tevgera xwendekarî belav kirin. Ji bilî wê, me hin pirtûk û alfabe yên kurdî jî ji nû ve weşandin.

Wekî min di destpêkê de got, min pêşî, ji xwe re, stran li hev dihûnandin; di pê re jî, min di ber xwe re, hin perçeyên helbestan jî dinivîsandin. Di sala 1992'yan de, dîwana min, ya bi navê 'Serfirazî' hate weşandin. Ji ber karê min yê di nav tevgera xwendekaran de, karê mamostetî û endametiya min, ya Yekîtiya Rewşenbîrên Welatparêzên Kurdistanê, têkilî û peywendiya min bi gelek wêjevan, helbestvan û rewşenbîran re pêk hat.

Wêjeya kurdî yan jî çanda kurdî di çi heyamê û çi rewşê de ye?

Ka em pêşî pirsê zelal bikin û paşê bersivê bidin. Em di bin wêjeyê de ma-

**Kurdistanê ku
ava bibe, divêt,
gelek demokrat be.
Wekî çawa em îro
dibînin, ku li ser pêl
û perdeya MED-TV
bi hemû zarava û
zimanên ku li
Kurdistanê hene tê
axaftin, divêt di
pêşerojê de jî, her
wisa be.**

neya torevanî yanê edebiyatê têdigihi-nin. Lê belê peyva çand bi maneya kul-turê tê bikaranîn. Ji lewre, çand mijareke pir fireh e. Çanda gelekî, hemû zanîn û bermaya wî ye, çî zanistî, çî huner, çî folklor, çî ol, heyanî awayê axaftin, xwarin û vexwarina wî jî çandê tê hejmartin. Ji bona vê yekê, ka em tenê li ser wê-jeyê rawestin.

Gava em li wêjeya kurdî bikolin, di-vêt em hinekî cudahiye têxin navbera rewşa wê ya bi kurmançiya Başûr û rew-şa wê bi kurmançiya Bakur. Rewşa wê-jeya kurdî bi kurmançiya Bakur, piştî şe-rê cihanê yê duwem, kete demeke gelekî dijwar. Ji ber zordestiya dijmin, bi taybe-tî jî zordestiya dewleta tirk, rewşenbîrên kurdan ji warên xwe bi dûrketin û şerpe-ze bûn. Beşek ji wan li Sûriyayê gihabûn hev û hewldan, ku bingeha wêjeyaniye-ke nûjen deynin. Lê di pêre, li wir jî, rê li wan hate girtin û bêderfet man. Ji deh salên 70'î, 80'î û vir de, xasim li Ewrû-payê, êdî careke din wêjeya kurdî (ya bi kurmançiya Bakur) tê vejandin. Êdî des-tan, roman dîwanên helbestan û pirtûkên din bi hejmareke hêja tene çapkirin. Lê ji bona hin sedeman, ev pêvajoyê bi lez pêş ve naçe. Ka em çend asteng û aloziyan li vir bi nav bikin û hinekî li ser rawestin:

Astengên zimani

1. Awayê gramêrê, yanê awayê nivî-sandina kurmançiya Bakur bi tîpên lati-nî, hîn di nav rewşenbîrên kurd de nebû-ye awayekî hevbeş. Hin rewşenbîr hene, ku pirtûkan dinivîsinin, lê ew hîn gramê-rê nizanin. Pir caran dezgehên çapeme-niyê jî çawa reşbelek hatiye nivîsîn, wi-sa jî wê çap dikin. Ev jî dibe sedem ku ew berhem ji hêla rewşenbîrên din ve neyê xwendin û wisa jî bînîrx bimîne. Tevî ku ew berhem dibê ku berhemeke baş be jî.

2. Kurmançiya nivîskî û zaravayên me, yanê tunebûna dezgeh û avahiyên fermî yê zimani dibe sedem ku pir ca-ran kurmançiya bilind û zarava û devo-kên herêmî tev li hev bibin.

3. Heya niha hîn ferhengeke kur-dî-kurdî ya baş, ku maneya bêfeyên kur-dî bi kurdî bide û awayê nivîsîn û bika-ranîna wan zelal bike, daneketiye mey-dana wêjeyaniyê. Li hêla din, pêwîstiya me bi hin lêksikonan jî heye. Ev ji bo pêşveçûna wêjeyaniya kurdî gelek gi-rîng in.

Astengên taybetî yê gelê kurd û we-latê wî Kurdistanê çi ne?

Yek, rewşa bindestiyê rê nade, ku gelê kurd bi zimane xwe bixwîne, bini-visîne û çand û wêjeya xwe nas bike. Di vî warî de rewşa kurmançiya Başûr ji ya Bakur baştir e. Gava piraniya gelekî ni-karibe bi zimane xwe bixwîne, hîngê dê çawa wêjeyaniya wî pêş ve biçe û geş bi-be? Wêjeyaniya kurdî li ser axa Kurdi-stanê, ew jî wekî gelê kurd, di bin zor û pestana dijmin de ye. Li piraniya herê-



mên Kurdistanê, gava pirtûkeke kurdî li ba kesekî peyda bibe, dibe ku ew pirtûk li ser matematîkê be jî, xwediyê wê dike-ve binê zindanan û gelek lêdan û îşkence dibîne. Di rewşeke wisa de geşbûne-ke wêjevanî ne gengaz e. Ew rewşenbî-rên ku li Ewrûpayê ne jî, çî nivîskar, çî helbestvan, di rewşeke wisa de, ji xwen-devanên xwe hatine birin. Bêguman, ev astenga siyasî ya herî mezin e li ber pêş-veçûna wêjeyaniya kurdî.

Astenga duwem, ji ber rewşa taybetî ya gelê kurd, heya niha avahî û dezgehên rewşenbîrî yê serbixwe hîn baş rûneniştine û bi rê neketine. Gava berhema ni-vîskarekî/ê, tê weşandin, yan belav nabe yan jî ji hin hêlan ve, bi sedem yan bêse-dem, şerê wê berhema hanê tê kirin; û ya herî girîng, navendiyêke fermî nîn e ku wê berhemê binirxîne, ka çî başî û çî ne-başiyê wê hene?! Heya kîjan pêpelûkê (derece) nivîskar û di vî berhemê de ser-kefî bûye?. Ji bona pêşveçûna wêjeyani-ya kurdî, ev xala dawî gelek girîng e. Peydabûna Yekîtiya Nivîskarên Kurdi-stanê û PEN a Kurd belkî vî pirsgrêka hanê ji me re vereşîne û vî valahiye da-gire.

Bi awayekî gelemperî, tevî asteng û kêmasiyan, wêjeya kurdî dîsan jî geş di-be û bi lez bipêş ve diçe. Çiqas ew asten-gên jorîn kêmbin yan jî nemînin, ew qas jî, wêjeyaniya kurdî xurt û rewşen dibe.

Di navbara zaravayên kurdî de cuda-

Jkerema xwe di destpêkê de, hinekî li ser pirtûk û pişeyê xwe raweste, û me li ser têkiliya xwe ya bi wêjevan û rewşenbîrên kurd re agahdar bike?

Ez hîn di 19 saliya xwe de ji welêt derketim û di bihara sala 1966'an de hatim Ewrûpayê. Bêguman, dema destpêkê demeke gelek dijwar bû, heya ku hin caran min ji dest evîna welêt hêstir jî dibarandin. Ez hîn jî evîndarê axa welêt im, evîndarê gelê xwe me. Hin caran ev hesta hanê di dilê min de dikeliya û min ji xwe re stran li hev dihûnandin. Stranên min li xweşiya hevalên min jî dihatin. Ji ber ku wan didît ku, hesta wan jî dinimî-ne. Wê hîngê zimane min î nivîskî nebaş bû û ji lewre, min stranên xwe davêtin ser kasêtan.

Ez ji rojên pêşîn de ketim nav tevge-ra xwendekarên kurd û piştî sala 1975'an min çalakiyên xwe fireh kirin. Lê heya wê demê %90 ji weşanên kur-dan bi zimane biyanî bûn; bi taybetî jî weşanên bi kurmançiya Bakur gelekî kêmbûn. Di sala 1976'an de me hinek xwendekarên kurd ev pirsê jêrin li xwe kir:

Ma gelo, em dibêjin, ku dijmin zima-nê me qedexe kiriye û nahêle em bi zi-manê xwe bixwînin. Lê vaye li Ewrûpa her ziman serbest e. Ma gelo çima em li vir, xwe hîn zimane xwe nakin!? Ma ge-lo gava rojekê, yek ji van dijminên hanê bibêje: Fermo bi zimane xwe bixwînin, emê hîngê çî dibêjin!? Ma kî û emê bi çî gelê xwe perwerde bikin!? Ma kanê pirtûkên me!? Nexwe em bi xwe jî guneh-kar in, ji lew re divêt em ji îro de vî karî bikin.

Li ser vî yekê, me biryar da ku, em destpê bikin; em, pêşî xwe hîn zimane xwe bikin û di pê re yê din. Divêt em ji îro de, hemû belavok û weşanên xwe bi zimane kurdî biweşînin. Lê ma em ê ça-

Ji ber rewşa zimanê kurdî: Gunehkar in

Em dibêjin,
dijmin mahêle
em bi zimanê

xwe
bixwînin. Lê
vaye li
Ewrûpa
hemû ziman
serbest in.

Ma çima em
li vir, xwe
hînî zimanê
xwe nakin!?

Nexwe em bi
xwe jî
gunehkar in,
divêt em jî
îro de vî karî
bikin.

hatiye bikar anîn. Divêt em hên jî wisa bikin û em gotin û bêjeyan ji kurmanckî (zazakî) jî wergirin. Bi vî awayî emê hîn bêtir nêzî hev bibin. Ji aliyê din ve, divêt ew her du zaravayên din jî ji kurmançiya bakur wergirin. Ev yek dê yekîtiya me ya neteweyî hîn zexm, xurt û tund bike. Lê ev nayê wê maneyê, ku ez dibêjim em her sê zaravayan bikin yek. Bila zaravayên me hebin, lê li cihê ku em bêjeyan ji zimanên biyanî wergirin, emê ji zaravayê din wergirin, gava ew bêje li wir peyda bibe. Ez zanim, ku bi wergirtina bêjeyan zaravayên me nabin yek, ji ber ku hin taybetiyên wan hene û ew di gramêrê de ne mîna hev in; wekî pîrsa nêr û mê, kesandina lêkeran (fîl) û hevedudaniya wan.

Pîrsa yekbûna zimanê kurdî di pêşerojê de bi pîrsa çareserkirina doza Kurdistanê ya ramiyî (siyasî) ve girêdayî ye. Gava hat û wekî dilê me dixwaze Kurdistanê yekgirtî û serbixwe jî her çar parçeyan pêk hat, hîngê rewşa yekbûna zimanê kurdî jî li gorî wê dibe rewşeke nû û zaravayek divêt bibe zimanê fermî. Lê bi tu awayî divêt ew zaravayên din neyên perçiqandin. Kurdistanê ku ava bibe, divêt di her warekî de, Kurdistanê gelek demokrat be. Wekî çawa em îro dibînin, ku li ser pêl û perdeya MED-TV bi hemû zarava û zimanên ku li Kurdistanê hene tê axaftin, divêt, di pêşerojê de jî, her wisa rê li tu zarava û tu zimanî neyê girtin. Yanê wekî me got, pîrsa yekbûna zimanê kurdî, pîrseke baweriyê ye û bi pîrsa ramiyî ve girêdayî ye.

Gava em bîr ser dawîya vê pîrsa we, hîngê em dikarin bêjin: Ji ber ku pîraniya rewşenbîr, kurdzan û nivîskarên kurd bi yekîtiya axa Kurdistanê bawer dikin û bi hêviya avakirina welatekî serbixwe û yekgirtî dijîn, ji lew re, divêt ew di warê zimanî de ji bona pêkanîna vê pêşeroja ronak peyda bikin.

Zimanê kurdî, di rol û qonaxa kovar û rojnameyên kurdî de pêwîst e. Tu li ser çî bingehê bête avakirin?

Bi bîr û bawerîya min, ne rast e, ku em bêjin, em ê zimanê kurdî li ser bingehê

di loriyên dayîkên me de ne. Ew 'zanayên', ku zimanê xwe baş nizanin, divêt pîrsgirêka xwe, bi xwe çareser bikin.

Niha em bîr ser rewşa kovar û rojnameyên kurdî. Wekî me di destpêkê de jî got, em dixwazin di vî axaftina xwe de, li ser kurmançiya Bakur rawestin. Rewşa her du zaravayên din, divêt hin hevalên din bînin ser zimên. Bi rastî gava di deh salên şêstî û heftî de, li Ewrûpayê bi zaravayê kurmançiya Bakur kovar, rojname û pirtûk hatin weşandin pir tevlihevî û alozî hebû. Heya niha jî em bi temamî jî van tiştan rizgar nebûne. Lê hin bi hin êdî kurmançiyê xweşik peyda dibe. Di pir waran de hîn gelek tevlihevî heye û hinên nû jî pêyda bûne. Ew ên ku nû hîn kurmançiya Bakur dibin, di cudahiya nêr û mê de û di siwarkirina hevokan (cumle) de, gelek tiştan ser û bin dikin. Rola rojname û kovaran jî bi xwe ev e, ku van tiştan sererast bikin. Lê gava berpirsiyarên rojname û kovaran ne di vî tengê (sewiye) de bin, hîngê rewşa me gelek dijwar dibe û pir dem ji me re pêwîst e.

Bi roleke çawa neteweya kurdî berz dibe û cesteke xurt, zexm ye neteweyî tê avakirin?

Ev pîrs pîrseke gelekî girîng e û li gorî heyama dîrokî ya ku niha gelê kurd tê re derbas dibe, pîr-



sa rojane ey bi xwe ye. Heya niha gelek danûstandin û lêkolîn li ser vî pîrsê nehatiye kirin û bi bawerîya min dê gelek hêja be, gava rewşenbîr û politîkvanên me li ser vî pîrsê rawestin.

Maneya neteweya gelekî rewîşt û xweseriyên wî yên taybetî ne, ew ên ku endamên wî gelî bi hev ve girêdidin û ji yên din cuda dikin. Maneya neteweya kurdî jî her tiştê hevpar û hevbeş di nav-

Bi awayekî gelemperî, tevî asteng û kêmasiyan, wêjeya kurdî dîsan jî geş dibe û bi lez pêş ve diçe. Çiqas asteng kêmbibin yan jî nemînin, ew qas jî, wêjevaniya kurdî xurt û rewşen dibe.

bera kurdan de ye, ku kurd pê tîr naskirin û jî gelên din berz û cuda dibin.

Tiştê hevpar û hevbeş di navbera kurdan de, berî her tiştî, çanda gelê kurd e, yekîtiya axa welatê wî ye, dîroka wî ya taybetî ye û berjewendiya wî ji bona standina azadî û serfiraziya xwe mîna hemû gelên din li ser goka zemînê ye.

Pêşî em ê hinekî li ser û çandê rawestîna û di pêre biçin ser dîrok û tevgera rizgariyê.

Çiqas gelê kurd çanda xwe, dîroka xwe û rewşa xwe ya îro ya bindestiyê nas bike, ew qas jî netewebûna wî xurt û zexm dibe. Ji hêla din ve geşkirina çanda gelê kurd û xurtkirina tevgera wî ya rizgariyê, maneya wê ji xurtkirina neteweyîtiya kurdî ye. Dijmin jî vî rastiyê dizane. Ji lew re, heya ji dest hatiye, rê li çanda kurdî û li tevgera rizgariyê girtiye û nehiştîye ku geş bibin. Lê niha ka me bipirsin: Çawa gelê kurd dê çanda xwe nas bike û wê geş bike?

Di vir de rola zimên roleke bingehîn e. Tenê bi rîya zimên mirovê kurd dikare çanda xwe bi temamî nas bike. Bi rîya zimên mirovê kurd dê wêjevaniya xwe, folklorê xwe; çî stran, çî çîrok, çî efsane, çî gotinên pêşiyên û awayê jiyane xwe nas bike. Dijmin zimanê kurdî jî qedexe kiriye, ji ber ku ew bi vî rolê baş dizane. Yanê bi gotineke din em ê bi zimanê kurdî bikaribin çanda xwe nas bikin û neteweyîtiya xwe xurt û zexm bikin.

Niha em biçin ser dîrokê. Naskirina gelî ji dîroka xwe re hêmaneke (faktor) gelekî girîng e. Dîrok dema jiyana me ya derbasbûyî ye û ew nema tê guhartin. Lê belê tiştê her girîng ew e; ku em van bûyerên derbasbûyî çawa dibînin û bi çî awayî jî zarokên xwe re dibêjin. Di dîroka her gelekî de rûpelên reş jî hene. Sedema spîbûn û reşbûnê jî heye. Divêt em her tiştêkî bi rastî û li gorî giraniya wî û sedemên wî jî bibêjin. Em tu caran bo-yaxê nexin dest xwe û rûpelên spî reş nekin û ne jî yên reş spî bikin. Bi bîr û bawerîya min, em xwedî dîrokeke dîr û dirêj û dewlemend in. Bav û kalên me, pêşiyên me, ji me re tevî kêmbûn û kurtiyên, dîrokeke rengîn û xemilandî peyda kirine. Divêt em wê baş nas bikin û pê serbilind û serfiraz bin.

Niha em bîr ser rola tevgera rizgariyê. Tevgera rizgariya gelekî û avahiyên wî yên politîkî, motora neteweyîtiya wî ne. Bi xurtbûna tevgera rizgariyê neteweyîtiya xurt û tund dibe; bi serkeftina tevgera rizgariyê, neteweyîtiya digihê qonaxa xwe ya herî bilind. Ji ber wî, çiqas tevgera me ya rizgariyê xurt bibe û avahiyên me yên politîkî di cih de rûnin, ewqas jî neteweyîtiya kurdî zexm û tund dibe.

bûn çawa ye û di pêşerojê de yekbûna zimanê kurdî wê çawa bibe? Gerek e kurdzan û nivîskar çî bikin?

Ka em dîsan di pêşiyê de pîrsê zêlal bikin û xaleyan deynin ser tîpan. Em di bin pîrsa zaravayên kurdî de, kurmançiya Bakur, kurmançiya Başur û kurmanckî (dimilî) têdigihînin. Ji bilî van zaravayên me yên sereke, di kurmançiya ma ye Bakur de, hin devokên me yên herêmî jî hene, wekî behdînamî, hekarî, şîkakî, botanî, xerzî, beyazîdî, xarpêtî-meletî û ruhayî-afîrî û hwd. Roja îro ku me, ji bo kurmançiya Bakur, devokê botanî wekî bingeh girtiye nayê wê ma-

"Tevgera rizgariya gelekî û avahiyên wî yên politîk, motora neteweyîtiya wî ne. Bi xurtbûna tevgera rizgariyê, neteweyîtiya wî gelî digihê qonaxa xwe ya herî bilind. Ew qas jî neteweyîtiya kurdî xurt dibe."

neyê, ku devokên din divêt nemînin. Naxêr, bi berevajî wê kurmançiya me ya Bakur bi wan devokên din hîn dewlemend û rengîn dibe. Niha kurmançiya bakur, ya ku em pê dinivîsîn ne bi temamî botanî ye; ew hin bi hin, bi hemû devokan dewlemend dibe. Ji hêla din ve, em ji zaravayên din pir gotin û bêjeyan werdigirin; bi taybetî ji zaravayê Başur; ji ber ku ew di heyama dawî de bêhtir

heke nû ava bikin. Zimanê kurdî, zimanekî kevn e û ji zû ve hatiye avakirin, ew zimanekî gelek dewlemend û rengîn e. Reh û damarên zimanê kurdî di çanda gelê kurd de ne, di pirtûk û dîwanên helbestvan û nivîskarên me yên bi nav û deng de ne, di folklorê me ya rengîn û dewlemend de ne, di stranên me yên gelêrî û giranbiha de ne, di çîrok û efsaneyên me de ne, di gotinên bav û kalên me de,

Ji "Binxetê" gurzek helbest

Keça Rustemê Zal

"diyarî ji bo Amûda bejinzirav"

Keça Rustemê Zal

Mîdya...
dema ringîniya te tê min,
pencere ji ber xwe ve vedibe
tiliyên şewitandî bangî pênûsê dikin
ey keça çiyayên bilind, daristanên
windabûyî
zarokên şewitandî, zindanên bêxwedî

Mîdya...
"Zenûbya" bejina xwe ji xemla te girê-
daye
"Semîramîs" ji awirên çavên te
jiyanê xwe nivîsiye

Keçê,
kanî dîroka min î veşartî ya li ser xaka
di hembêza te de?
wênekêşke, hemû, şîneyê di laşê peravê
min de
"Xabûr" di rojekê tal de ji min peyva te
kir
winda bûm, ez di nav pêlên wê de, bûm
straneke xweş di bejna "Feratê" de
ez te bi xwînê dinivîsim
eger tu bawer nakî, bipirse, ji ronîya di
çavê
wê şevê de, ji awazên dilê min
ji kolanên Amûdê di rojên sar de
ez bêyî te xwelî me, reşiyek bêşemal im
ji newqa xwe re bêj, tiliyên wî ne qels
in

Keçê...
çîroka vî -xemgînî- dirêj e
di dûrbûna te de ew tê kizirandin
dilê wî diherike wekî dîwarekî kevnar
ew ne yê berê ye,
ne "Memê Alan e" ku Zîna dilbixwîn
li ser gulolîkan bibarîne
ne jî "Qeysê" ku ji bo Leyla dîn bibe
ne jî zarokeke tu wî xêz kî li ser
kaxêzên spî
ne barana bej wê dixwaze, ne asoyê
bi wî nekene, wî bike fêrkera vekirinê
çar şaşitiyên wî hene

yek; gava ji dayik bû
du; gava nivîsandîye
sê; gava wê bimre
çar;!! gava ket hezkirina
keça Rustemê Zal...!!!


Ismaîl Kose/Amûdê

Devera Xewnê

Kilûdya...
neyara min bû
xecokê
dema berfê
şopa pêlava min didizî
dîsa ji seqema sînga Kilûdiya...
dihatime der!

ber bi te ve
ber bi ramûsa rok û ser benderên te de
xecokê
ji rehên xwe ...
dihatime der
hemû gava elesên hênik
li ser laşê min .. şîn dihatin

ku çend obali
di mafên xortaniya xwe de
kiribûn!
lê kî ye ê te jimaryar bike
ji te pirs bike:
gelo çend nalîn
ji kûrahiyên te hatine westî
û te hay jê nebû



Xêz: Nihat Türk (Başûrê Biçûk)

Ta ku tebayî te bibim
sibeha hemû cejna
Mewdanê dixwe...
diyarî te bikim
min nîn e mew-

dan!
Kakêşekê ez dêrandim
û
deryayekî mezin
Ez li seranserî nazdariya te...
belav kirim

lê mixabin
îsandina salan di çavên te de
dirkîn dibin...

çend cara omîdan tu ragirtî
û tu negihayî bendixana
dilê min

belê ez bi tenê...
dizanim ku çend dildar di sinorê evîna
te de

dibûn
û di dojhên eşqa te de sotiyar
lê dîsa te digel xewna xwe
xwe veziland
û melûliya temenê tazî
bi bîra xwe dianî

dinasî ku erêê...
kilît li deriyê asîmana têne vertepi-
landin
Lê belê min heyê
Siwarekî reş
li kolînkê dilê min
siwar e
sîkakên rojê di min
li hev dide
kêlik û hûrdemê xweşiya min
dihêjmere
kontrol dike...
ku hemû sehetên êvarî
û here û here

û here....

Ehmedê Xursî/
Qamişlo

ROZ

şînahiya çavên te
û ezman
Li deşta Mêrdînê
Di hevrikiyê de
çi ji hev re dibêjin
Roz...?
gulberojên vê deştê
Di dilana bayê sibe de
çima stûxwar in
Roz...?
zer çivîkên porê te
li derdorên KEPEZ
Di valahiyan şerpeze û bêzar in
Roz...?
û dilên xembar
di vê govendê de
çima xemxwar in
Roz...?
gelo heta kengî
wê Memo girtiye
zîdana Zînê be...?
û DERWEŞ
tim kuştîyê
Du çavên EDLÊBE...?
Ax dilê min...
CUDÎ ji aliyekî de
bang li min dike
ŞENGAL ji hêlekê de,
serê xwe li min ba dike
BÊSTÛN jî
ji ba xwe ve gazî dike
û ez?
Ez di LALEŞ'a evîne de
ji bo çavên ANAHÎTA
limêj dikim
Ax, dilê min î perçebûyî
di kîjan çemî de
te min bi nav bike
jîndar bike...?

Xemgînê Remo/ Dirbêsiyê

*Kepez: çiyayekî nêzikî Dirbêsiyê

*Bêstûn: Li Rojhilat çiyayek

*Anahîta: Di ola Zeredestiyê de xudewanê
evîniyê

Navenda Çanda Mezopotamya ya Stenbolê

● 2 gulan 1998 şemrê: Konser: Koma Rohhilat Saet:14:30

Teatra Jiyana Nû lîstika "Komara Dînan: Şermola"

● 3 gulan 1998 yekşem: Konsera Koma Gulên Xerzan Saet:14:30 Teatra

Jiyana Nû- Komara Dînan: Şermola

● 6 gulan 1998 çarşem: Semînera Înstîtuya Kurdî "Peymana Qesra Şêrîn"

Saet:18:00

● 8 gulan 1998 în: Pêşengeha wêneyan Mijar: "Ji jiyana me hin dîmen"

Wênesaz: Ahmet Belli.

CALAKIYÊN HEFTEYÎ



NÇM-Izmîr

● 3 gulan 1998 yekşem: Panel: "Di roja çapemeniya Navneteweyî de çapemeniya sosyalîst bi hev re" Amadekar: Ü. Gündem Saet:14:00

● 6 gulan 1998 çarşem: Çalakiya "Hekariyê bi Komîsyona Girtîgehên a IHD'yê re" Saet:18:00

● 8 gulan 1998 în: Panel: "Bi zimanê zarokan 'Zarok û Şer'

Beşdarî: Dengê Bahozê (Izmîr) Gulên Mezrabotan (Stenbol)

Koma Zilan (Mêrsîn)

Şitlên Azadî (Edene)

Di çareseriyê de rola çapemeniya tirk neyinî ye



Hefteya çûyî çalakiyên sedsaliya rojnamegeriya kurdî, bi sempozyûma ku roja 26'ê avrêlê li "Tanrî Zafer Tunaya Kültür Merkezi" pêk hat, qediyên. Di vê sempozyûmê de du mijar hatin şirovekirin; "Di çareseriyê kêşeya kurd de rola çapemeniyê" û "Li deverên cur bi cur rojnamegeriya kurdî." Beşa yekemîn a sempozyûmê, ji bilî axaftina Felat Dilgeş bi tirkî derbas bû, lê beşa duyemîn ji bilî axaftina du-sê axafbêjan, bi kurdî bû. Di beşa yekemîn de, li nik rola çapemeniya kurdî, rola çapemeniya tirk jî di çareseriyê kêşeya kurdî de hate nîqaşkirin. Di vê beşê de kesên mîna Yılmaz Çamlıbel, Nevin İl, Müslüm Yücel, Hüseyin Aykol û Felat Dilgeş peyivîn. Nîrxandinên Müslüm Yücel ên li ser şer balkêş bûn. Her wiha Hüseyin Aykol jî bi tesbîta xwe ya bi rengê 'rola çapemeniya tirk di çareseriyê de nîn e, lewre ew awêneyeke kirêt a ku civakê nîşan di-de ye.' serinc û bala beşdarên kişand.

Di beşa duyemîn de jî kesên mîna Cemşîd Heyderî, Nimet Aydın, Ahmet Aras, F. Hüseyin Sağınç, Ahmet Zeki Okçuoğlu, Helim Yusiv peyivîn. Di vê beşê de axaftina A. Zeki Okçuoğlu bi tevahî ji mijarê dûr bû. Lê agahiyên ku Cemşîd Heyderî û Helim Yusiv li ser rojnamegeriya Başûr û Başûrê Biçûk dan, balkêş bûn.

Çalakiyên ku berî sempozyûmê hatin lidarxistin, ji aliyê beşdariyê ve baştir bûn. Dîsa gelek kesên ji derdorên cuda beşdarî kokteyl û vekirina pêşangehê bûn.

Di forûma bi tirkî ku roja 24'ê avrêlê pêk hat de, mijar bi giranî etîk û pîvana rojnamegeriyê bû. Her wiha, li gorî van pîvanan çapemeniya kurdî

tirk hate nîrxandin. Digel aliyên erênî, kêmasiyên çapemeniya welatparêz û şoreşger jî hatin zimên. Di vî warî de gengeşî pêk hat. Serkêşiya ramana rexnegir, Muhsin Kızılkaya kir, kesên mîna Hayrettin Çelik û Temel Demirel li hemberî vê dîtîne derketin. Van kesên navborî dan zanîn ku, hinek kêmasiyên ku ji ber nekemilîna civaka kurdî rûdîdî, nikarin bibin hinceta rexneyên bi vî rengî.

Di heman forûmê de, rojnamegera fransî Nicole Pope jî dîtînen xwe anîn zimên û got: "Ji ber ku li Tirkiyeyê nîrxên demokrasîyê bi cih nebûne, pîvanên rojnamegeriya objektîf jî li ber çavan nayêne girtin." Di nav gotînen Pope de, xala girîng li ser helwesta dewletên a li hemberî kêşeya kurd bû. Wê got: "Êdî nûçeyên li ser kurdan bala berpirsên çapemeniya Ewropayê nakişîne. Ez nîzanim çima, lê belê pêşî ji me re gotin, 'dema ku di bûyereke du sê kes mirin bikin nûçe, piştî gotin, 'heta di bûyeran de deh kes nemirin nekin nûçe', niha jî qet eleqeyê nîşan nadin."


Di warê pîvanên rojnamegeriyê de jî, têgihên mîna "objektîfî, bêlayanî û layangirî" hate nîqaşkirin. Di vî warî de piraniya beşdarên li ser xalê gihîştin hev; "Di nûçegihaniyê de bêlayanî ne gengaz e, bes layangirîyeke binamûs pêwîst e." Çarçoveya layangirîyeke bi namûs jî, ji hêla rojnameger Ragıp Duran ve hate danîn, 'divê dîtînen hemû aliyên nûçeyekê tê de cih bigirin.'

Di forûma ku roja 25'ê avrêlê li NÇM'ê bi kurdî pêk hat, beşdar bi giranî li ser pîrgirêkên rojname û kovarên bi kurdî û girîngiya weşana bi zimanê kurdî rawestiyên.

A. WELAT/STENBOL

TÎŞK

Niwisê nûştokê ma nêkewte destê ma



KAZIM TEMURLENK

Seseriya rojnamegerîna kurdî Amed de jî pîroz bi

Roja 28ê avrêlê 1998 de, banê HADEP'a Amed de hetê komîsyonê Ciwananê HADEP, şaxê Amed de seba "Seseriya rojnamegeriya kurdî" yew panel ame viraştin.

Panel de, rojnamê ma ra Roşan Lezgîn, Ûlkede Gündem ra Kemal Şahin û kovara Özgür Halk ra Abdullah Gündüz beşdarê panelî bî. Panel de 200 ciwanî vêşêrî jî wendoxê Zankeyê Dicley amadey bî.

Panel deqêk vindertîne seba rêz û hurmet girotinê şehîdan dest bi ci kerd. Nûnerê kovara Özgür Halk şaxê Amed Abdullah Gündüz dîroka rojnamegeriya Kurdistanî ser bi awêka derg vindert û pirofilê rojnamegeranê kurdan ard zîwan. Gündüzî vat: "Kurdan seba rojnamegeriya xo aver berê, guna xo kerda hubir."

Kemal Şahînî jî, qisanê xo de bal ant qedera kurdan ser û vat: "Qedera rojnamegeriya kurdan jî, zey qedera kurdan a. Heta ku kurdî netewebûna xo tamam nêkerê û çarenûsa xo azad nêkerê, rojnamegeriya kurdan jî tam nêkemeliyane." K. Şahînî persê yew ciwanî ser ke pers wina bi 'Rola rojnamêko rojane, covakanê zey ma de çi ya?' vat: "Serê merdimî go roja bîn pêro dinya pêbihesîyo."

Roşan Lezgînî jî, rola çapemenî ya di jîyanê şaran ser ro vindert û berdewamê qisanê xo de vat: "Belkî rojnamegerî seba şaranê bînan, bi tenê nûçegihanî û agahî girotin a. La belê, seba ma kurdan, hem enê yê û hem jî geşkerdî û avêberdîne zîman û çandê ma kurdan ê. Roşan Lezgînî berdewamê qisanê xo de wina vat: "Ero şerê kurdan seba çi yo? Ma go vacin: "Ma nasnameyê çandî înan o. Ewro seba ku wendoxe zîwanî kurdî çiniyê tirajê çapemeniya kurdan jî zaf nîzîm a. Geşkerdîne rojnamegeriya kurdî û zîman. Çandê kurdî zey goşt û astî pêwa yê."

Panel di saetî dewam kerd û bi pers û verpersanê beşdarên û panelîstan qedîya. Pêro beşdarên soz da ku go wayîr li rojnamegeriya kurdî veciyî û her go yew xo zey rojnamegerêkê kurdan bihesewnê.

A. WELAT/AMED

Rovî û Quling

Dibê rojekê ji rojan, qulingek û roviyek li hev rast hatin û ji hev re gotin: "Kanî em bibin destbirak." İcar em ê jî li destbirakiya wan camêra binêrin, bê çawa des tpekir û çawa xilas bû. Rovî di nav dahlê de ji xwe re li nê-çirê digeriya. Rastî quling hat. Rovî:

- Qulingo tu çi dikî lo?

- Wellehî min got, ez ê ji xwe re dakevim nava vê dahlê, bê ka ez ji xwe re tiştêki peyde nakim.

- Baş e, baş e. Ez jî bi vî awayî hatibûm. Ma tu nayê em bibin destbirak.

- Ku li ba te maqbûl e. Vê gavê ka destê xwe bide min û em ji îro pê ve destbirakê hev in. Ji bo vê jî dibê em destbirakiya xwe pîroz bikin; haziriya xwe bike, tu sibe mêvanê min î.

- Ez çawa bikim destbirak, min qebûl e. Lê belê şertê min jî heye: Divê tu ji bibe mêvanê min.

- Şertê te li ser çavên min.

Her du dost bi vî awayî ji hev getiyan. Her kes çû mala xwe. Rovî di ber xwe de, bi vî awayî difikire: "Ka ez ê tiştêki ji wî re çêkim, ku tiştê wilo berê nehatibe serê wî. Divê ez ji wî re lebixeke (cureyek şorbe ye) rûn çêbikim û vala bikim ser tehta rast û nikulê wê hemû bibe xwîn".

Dek û dolabê rovî ev in. Quling ji maliyê xwe re dibêje:

- Ez mazûvanê rovî me. Em bûne destbirakê hev. Divê ez rabim herim. Niha feqîro çavên wî li ser riya min in.

Quling dikeve rê û dihere.

Rovî:

- Gelo ev kî ye li derî dixê?

- Ez im destbirak. Ma te çi zû ez ji bîr kirim!

- Wey ehlen, ehlen, ser seran, ser çavan! Ma çawa ezê te ji bîr bikim. Ji sibehê de ez li hêviya te me. De ka kerem bike.

Quling derbasî hundir dibe. Kêfxweşiyê didin hev. Rovî:

- De ka hîn ku xwarina me necemidiye, em herin ser sifreyê.

Rovî lebîxa xwe vala kiriye, ser tahtekî şahîk û li ser bela bûye. Feqîrê quling dike nake tiştêki nikare bixwe. Nikulê wê tev dibê xwîn. Di ber xwe de çend xeberan (sixêfan) ji rovî re dide û dibêje: "Bise kero! Ma ez ê vê ji te re bihêlim!" Quling dibêje:

- Destbirakê rovî. Xwedê zêde bike. Min têr xwar. Peyre xwe dide alî. Rovî dibêje:

"Wey afiyet be" û bi xwe dikeve ser şorba xwe, bi zimanê xwe dialêse. Quling:

- Vêca sibê tu mêvanê min î.

Piştî çend rojan quling, berî ku rovî were mêvandariyê wê, danûya xwe dikelîne û dixê kundirekî stûdirêj û haziriya xwe dike. Rovî li deriyê quling dixê û derbasî hundir dibe. Quling dibêje:

- Wey tu li ser çavên min hatî. Ka hema kerem bike ser sifreyê" û kundirê tijî danûk datîne ber rovî. Rovî dike nake devê wî nagihêje danûkan. Çiqas li ber xwe dide, vala ye. Rovî:

- Xwedê zêde bike. Min têr xwar.

- Afiyet be birako.

Quling bi xwe dikeve ser danûkên xwe û fit dike. Rovî:

- Destbirakê quling, de ka em vê dostaniyê xwe hîn jî bi pêş ve bibin. Em bi dorê rahêjin hevdu.

- Bila be, tu çawa dizanî wekî te ye.

- Vêga were li ser pišta min siwar bibe. Ez ê te bigerinim.

Rovî piştî ku qulingê hilgire, tadeyê lê dike. Quling:

- Destbirak te ez kuştim... Te mala min xera kir! Te perî bi min ve nehiştin...

Quling diqire û gazinê xwe dike lêbelê dîsa jî rovî mîna xwe dike. Quling peyva xwe dom dike:

- De ka destbirak, icar dora min e. Were ser pišta min siwar bibe û xwe hişk bi stûyê min bigire, naxwe tê bikevî.

Rovî li ser pišta quling siwar dibe û xwe hişk digire. Rovî:

- Ez hazir im birakê quling.

Wê gavê quling difire û bi hewa dikeve.

Bilind dibe, bilind dibe. Quling dibêje:

- Birakê rovî, ma erd hîn çiqas ji te xuya

- Destbirakê rovî, de ka ji kerema xwe re hebekî here ser baskê min, pišta min pir qerimî (westiya) ye.

Rovî xwe sist dike ku here ser baskê quling, wê gavê quling hema xwe ji bin rovî dide alî.

Rovî dike gazî û hawar û dibêje:

- Birakê quling ez di bextê te me! Wiha li min neke... Zarokê min hûr in. Min xelas bike ji vî halî. Tu çi dixwazi ez li ber emrê te amade me.

- Wellehî birako destbirakiya me heta vir bû. İcar tu li qusûrê nemezyînî, ez diherim. İcar tu û bextê xwe.

Vê gavê meleyê gund derketibû ser mizgeftê ku bang bide. Çawa dinêre ku roviyek ji ezmên datê.

Mele:

- Allah û ekber rovî dibarin. Allah û ekber rovî dibarin.

Mele yekcar kurkê xwe li ser mînareyê dihêle û baz dide. Rovî jî şansê wî heye. Ç-

te re bînim.

Gur diçe sed mihan dkuje û tîne mala rovî. Bang li rovî dike:

- Vaye min emanetê te anîn. Ji kerema xwe berî ku berf bikeve, kurkê min xilas bike.

- Mitala neke. Ez xalê te me.

Heyv derbas dibe. Gur dîsa tîne mala rovî. Gur dibêje:

- Vaye ez hatim înceleh te kurkê min qedandiyê.

- Malmîrat heta niha tu li ku bûy. Min derek nehişt, ez li te geriyame. Heriya ku te anîbû têrê nekir. Hîn he rdu zendikên wî û bestûka wî mayiye. Divê tu pêncî mihên din bînî.

- Ma te çawa kir? Sed mihan çawa têrê nekir?

- Ma ez derewan li te dikim, ma tu yeqîn nakî? Vaye kurkê te nivî maye. Ha ji te re tu çi dikî jê bike, ez nema çêdikim...

- Xalê rovî, heyrana çavan, li qusûra min nenêre. Min cahilî kir. Ez çawa ji te bawer nakim. Ez ê ji te re pêncî mihên din jî bînim.

- De baş e, baş e. Tu careke din min hêrs neke.

Gur dihere pêncî mihên din tîne mala rovî û bang lê dike.

- Vaye min emanetê te anîn. Çendî carî bi vî awayî derbas dibe. Gur mihên şivên nehiştin. Çile xilas dibe, dikevin biharê. Gur rojekê hêrs dibe û diçe devê deriyê rovî. Gur:

- Malmîrat ma te neqedand. Vaye em ketin biharê. Min ji bo te mala şivanan xera kir. Mihên wan min talan kirin. Ev mîrat bû çi?

- Birakê gur. Ma te negot ku bavê min kurkvan e? Bapîrê min kurkvan e? Ma ez çawa kurkvan bibim?

Gur:

- Ezê mala te bi ser te de xera bikim. Ma hev qas te ez xapandin, doza çi ji min dikî?

Gur diçe kundirekî dirêj, çend bixuran dixê hundirê wî, bi devê qula rovî de girê dide. Wextê ku ba lê dixê, dike xirexir. Rovî di ber xwe de dibêje: "Wele ev tahtê qul dike."

Rovî bi vî awayî çend heyvan derbas dike. Qutê wî namîne. Taliyê pîreka xwe û zarokê xwe ji dixwe, ji bo ku birçî nemîne. Her diçe dengê xirexirê xurtir dibe. Rovî dinêre bi vî awayî bimîne wê ji birçîbûnê bimire. Difikire ku xwe ji vî halî xilas bike. Dibêje: "Gur min parçe parçe bike jî ez ê derkevîm."

Hêdî hêdî diqedime ber deriyê qulê. Xwe zirav dike wekî derziyê dike û dibêje "Ya Allah" û baz dide. Ji tîrsa li pišta xwe namezyîne, hetanî ku ji hal dikeve. Dimezyîne ku kes li dû wî xuya nake. Meraq dike, hêdî hêdî li paş xwe vedigere, heta tîne mala xwe. Dinêre ku bi devê qula wî ve kundirekî stûdirêj girêdayî ye. Bixur tîne de ne, dema lê dixê dike xirexir.

Rovî: "Way mîrato, hişyaro, niha te ev felek anî serê min" û dom dike: "Ezê feleka bînim serê te."

Kundir vedike, tîne nava çemê dadike. Dema kundir dike "biq biq"rovî dibêje:

- De bixeniq, bixeniq, te mala min xera kir.

MEHMED SİNCAR/
Girtîgeha Aydinê



ye?

Rovî:

- Hîn zehf e.

Quling dîsa jî bilind dibe, piştî saetekê dibêje:

- Birakê Rovî ma hîn jî erd xuya ye?

Rovî:

- Erê. Hîn bi qasî benderêkê xuya ye.

Quling bilind dibe, di nava ewra re derbas dibe û dîsa dipirse:

- Erd ji te ve xuya ye?

- Bi qasî sifrikê.

Quling dîsa tebabekî bi hewa dikeve û di nava ewran de winda dibe. Vê carê dîsa ji Rovî dipirse:

- Ma hîn jî erd xuya ye?

Rovî:

- Wellehî tiştêk nema xuya ye.

wa tîne li ser kurkê mele dikeve. Dinêre hemû herî ye. Di cih de li xwe dipêçe û baz dide. Diçe mala xwe. Di rê de rastî gurekî tî.

Gur:

- Birakê rovî ev kurkê hanê te ji ku anî ye? Ka tu nafiroşî min?

- Malmîrat ma tu nizanî ez kurka çêdikim. Navê min li dinê belav bûye. Lê te hê jî nebîhistiye, qaşo tu cîranê min î. Wellehî ji te re şermeke mezin e.

- Li qusûra min nemezyînî. Min nebîhistibû heta niha. Lê belê yekî ji min re jî çêke. Meyze bike bihaya wî çiqas be, ezê bidim.

- Hema ji bo xatirê çavê te, bila ji te re bi sed mihan be. Mihên xwe werîne mala min û piştî heyveke din, were kurkê xwe bibe.

- Sed mih û ne tiştêki din. Tu vî çelayî min ji vê sermayê xilas bike, te çi divê ez ê ji

Jiyana Rewşen

“Erê ew roj hat. Zivistanê ne zora kulîlkê bir, ne jî dikaribû nehêle bibîşkive û dilê dojhê çirand kulîlkê û mizgîn li rojê kir. Mizgîn li we.”

Di pêşgotina hejmara Jiyana Rewşenê ya dawîn (18) de, der barê “Sedemîn Salvegera Rojnamegeriya Kurdistanê” de wisa hatiye gotin. Di vê hejmara taybet de, sebareti bi dîroka rojnamegeriya Kurdistanê dosyayek hatiye amadekirin. Ev dosyaya bi sernavê “Perçiqandina Dilê Rastiye: Rojnamegeriya Kurdî” ji pirtûka Müslüm Yücel bi navê “Dîroka Çapemeniya Kurdî: Tekzîp” hatiye wergerandin. Di vê dosyayê de kêmasiya berbiçav ew e ku, her çendê di pirtûka navborî de, li ser rojnameyên Welat, Welatê Me û Azadiya Welat hatiye rawestandî jî, lê di dosyayê de van rojnameyan cih negirtiye. Di nava vê dosyayê de, piraniya rojnameyên ku li Bakur belav bûne, hatine nasandin.

Di vê hejmarê de Rênas Jiyana bi helbesta xwe ya bi sernavê “Li Herî Jorîn Firîna Bêbask”, Kawa Nemir “Jiyana Ku Nehatîne Redaktekirin”, Arşevê Oskan “Koçero”, Kemal Orkun “Wekî Pîramîdên Misîrê”, Nihat Çelik “Gulsora Min”, Zeynel Abidin “Wehda Mezin” û Rifet Şexo jî bi helbesta xwe ya bi sernavê “Tiştêk Wek Birakujîyê” cih girtiye.

Di vê hejmarê de nivîsên ku balê dîksînin ev in: Hevalonuray Şen, Selîm- F. Huseyn Sağıç, Li Wir Li Welatê Min Bihar e-Rifat Duman, Nameya Malbata Şervanekî-Bêdeng. Her wiha Fevzî Bilge û Muhamed Muhamed jî bi kurteçîrokan xwe di vê hejmarê cih girtine.



Nûbihar kete şeş saliya xwe

Temendirêjtîrîn kovara kurdî ya li Bakur, Nûbihar, bi hejmara xwe ya 60'î, gihîste şeş saliya xwe. Berpirsiyarên kovarê, ji ber hindê bo xwendevanên xwe spasdarî û rêzên xwe radigihînin û banga alîkariyê li wan dikin. Ev hejmara vîrnî, li dêl ve hejmara rezbera 1997'an hatiye weşandin.

Di vê hejmarê de nivîsa herî balkêş, hevpeyvîna ligel kev-nemebûsê kurd Giyasedîn Emre ye. Emre, di sala 1954'an de ketiye meclîsa Tirkîyê û bûye yekemîn mebusê serbixwe yê Tirkîyê. Ew, di Dadgehên Yassiadayê de ligel Adnan Menderes hatiye dari-zandin û şeş salan ceza lê hatiye birîn.

Kalikên Ecevit Kurd in

Di vê çavpêketinê de, agahi-yên herî seyr û balkêş, yên li ser binyata Serokê Giştî yê Partiya Demokratîk ya Çepgir Bülent Ecevit in. Bi pey agahi-yên Giyasedîn Emre, bavê Ecevit Mustefa Beg kurd e. Lewre li ser kêla gora wî, ya ku li Kastamonuyê ye, wiha hatiye nivîsandin: Haza qebru

Mustefa Beg, Min umera'î el-ekrad (Ev gor ji begên kurdan ya Mustefa Beg e)”. Bi bawerî-ya Emre, kesên ku zilm û zorê li kurdan dikin ne tirk in, kesên ku bi eslê ne tirk, lê tirkperest in.

Her wiha mebusê berê yê kurd, li ser jîne-nîgariya Seîdê Kurdî, serdema Partiya Demok-rat (DP) û Dadgehên Yassiadayê dîtî û serpe-hatiyên xwe vedibêje. Bi dîtina Emre, tiştên ku nasnava (kimlik) kurdan parastine, medrese, dî-wanên axayan û şêxên kurd in. Di nirxandinên Emre de, pesndayîna ji bo Adnan Menderes ber-biçav dibe.

Li aliyê din Giyased-dîn Emre, li ser helwesta Tirkîyê ya ji bo kurdan û çare-seriya Kurdistanê dîtî-nên xwe anîne zimên. Bi pey nirxandinên Emre, kurd pêwîst e, xwe ji mîrîtî û eşîrtiyê bişon û li pey ronakbîrên xwe bimeşin. Dîsa li gorî wî, kurd û tirk berî hemû gelan, dikarin di nav xwe de hevaltiyeke baştir bimeşînin û çareserîya kêşeya

Kurdistanê jî girêdayî netewe-bûna kurdan e.

Di vê hejmarê de, nivîsên Süleyman Çevik, Aqîl Miha-




cir, Newzat Nûrullah û Memê Alan cih digirin. Helbestên Ba-ba Tahîrê Uryan, Mela Meh-mûdê Yûsîfî, Tehsîn Îbrahîm Doskî, Xweşbêj, Salih Baran, Mafhuz Yildiz û Sîpanî jî hatî-ne weşandin. Nivîskarên kurte-çîrokên vê hejmarê jî Celal Alê Ahmed û R. Karakaya ye.

SERWÎSA ÇANDÊ

Mizgînî

OSMAN ÖZÇELİK



Di vê meha adarê de Kitabî Mukaddes Şirketi' bi navê “Mizgînî” Încil a ku bo kurdî hatibû wergerandin, weşand.

Gava kitêba pîroz “Mizgînî” ket destê min, min dev ji xwendina hemû pirtûkên di destê xwe de berda û ez ketim nav rûpelên Mizgînîyê.

Bi rastî ez ji xwe nebawer bûm ku, ez ê bikaribim xwendina kitêbê bibim serî.

Sedema vê nebawerbûnê, ne ez bi xwe bûm. Tecrûbeyên xwendina kitêba pîroz a din, Quranê ez çavtirsî kiribûm. Mealên Quranê yên bi tirkî jî, hema mirov dikare bibêje ji erebiya wê diwartir in. Meala Quranê ya bi kurdî ya Mele A.Varlı, tevî ku xizmetekî qenc e jî, di aliyê ziman de, tew bûye kulekê û ketiye ser dilê min, qet nebêjin.

Biryardayîna wergerandina Încilê, bêsîk ji bo zimanê me xizmetekî mezin e. Her kes qebûl dike ku, zimanek têra wergera

Mizgînîyê bike, ew ziman pêşketî û fireh e. Dîsa tê zanîn ku, Încil bo kîjan zimanî bê wergerandin, ew ziman dikeve bin stara kitê-ba pîroz û bi milyaran bawermendên ola xiristîyanîyê lê xwedî derdikevin û ziman dibe zimanekî nemir û herheyî.

Ji bo amadekirina Mizgînîyê komisyonek, ku ji 10-15 kesan pêk hatiye, dixebite. Komîsyon ji pisporên olê, filolog (zimannas), pisporên Încilê û pisporên zimanê kurdî pêk hatiye. Pisporên zimanê kurdî, ku di nav wan de ji bilî kurdan, suryanî, amerîkî û alman jî hene, bi hemû zarava û gelek devokên kurdî dizanin.

Mizgînî, li gorî zimanê yewnaniya kevn a esilî tê wergerandin û bi gelek wergerên din re tê rûbirûkirin. Ji bo her ayetekê bi rojan munaqeshe û civînên kirin; bi dehan, sedan raporên nivîsin. Her rapor, her pêşniyaz tê-qeydkirin, dikevin dosya û mêjiyên kompûter-an û tê arşivkirin. Peyre komîsyon ji aliyê teknîka rêzimanê kurdî ve li wergerê hûr dibe. Zimanê wê sivik û zelal e û xwendin û têgiştinê hêsan dike.

Hêj tu sazîyên me yên neteweyî nîn in ku zimanê me zelal bikin, peyvên nû biafirînin an, jî nû ve vejînin û bi vê riya zimanê stand-ardîze bikin. Ji ber vê yekê kitêbên pîroz û her wiha klasîkên edebî wisa bi metodên

zanistî bîr wergerandin, ji kurdî re dibe xizmetek pîroz û hêja.

Mizgînîya Lûqa, Margos û Metta, di sala 1919'an de li Newyorkê bi tîpên erebî li kurdî hatiye wergerandin û sê kitêbên cuda ne.

Di sala 1922'an de Mizgînîya Metta û di 1923'an de jî Mizgînîya Marqos li Stenbolê, bi tîpên erebî bûye kurdî û hatiye weşandin.

Prof. Kamûran Bedirxan jî Mizgînîya Lûqa wergerandiye kurdî û çapa yekem ji aliyê Înstîtuya Kurdî ya li Bonnê ve hatiye weşandin. Çapa duyem jî, weşanxaneya Dozê li Stenbolê di 1992'an de, bi tîpên erebî û latînî weşand. Yekem car tevahiya Mizgînîyê bi kurdî di sala 1812'an de, bi tîpên ermenkî hatiye weşandin. Niha Mizgînîya herî kevn ya di destê me de ev e.

Em nivîsa xwe bi du ayetên Mizgînîyê biqedînin.

“Bixwazin wê ji we re bê pêşkêşkirin. Bigerin hûn dê bibînin. Li derî bixin, ewê ji we re vebe. Çimkî yê ku dixwaze, distîne û yê ku digere, dibîne û yê ku li derî dixwe, jê re vedibe.” (Mizgînîya Lûqa. Beş 11. Ayet 9-10).

“... Û kîjan mala hûn bikevinê, pêşî bêjin, aşî li ser vê malê!...” (Mizgînîya Lûqa. Beş 10) Aşî li ser we be...!

Elîf bê û mele

Malbateke gundî zarokekî xwe li ber destê meleyê gund dide ber xwendina erebiyê. Rojekê diya wî gazî kurê xwe dike û dibêje: "Kurê min ka were, ev salek e tu diçî xwendinê, tu çî hîn bûyî?" Kurik bersiva diya xwe dide: "Elîf bê, mele dadê divê" û dibêje ku heta niha mele ev tişt hînî wî kiriye. Jinik pir diqehire û bi mêrê xwe dişewire, dixwazin fenekan li mele bikin. Ji kurê xwe re dibêje: "Here ba mele bêje daye jî dersek daye min û gotiye 'Elîf bê, dadê jî mele divê'. Lawik vê dursa ku ji diya xwe hîn bûye, tê ji mele re dibêje. Mele ji kêfa lê ye bifire. Hê ji ku banga êvarê re saetek maye, hildikişe ser mînareyê, berê xwe dide mala jinikê û bang dide: "Allahû ekber, Allahû ekber". Jinik li deriyê malê li bersiva mele dide: "Heyrillah, heyrillah/Navê mirîşka min varap e /Serê katara wê şarab e/Ez ê ji mela re dixme şîş û kebab e/Mereqa ser dilê min melayo/Kedera ser dilê min seydayo." Mele banga xwe berdewam dike: "Mêrê te limal e ya neeeee!" Jinik bersiv dide:

"Dilê min hêşê mêşê/Min heft bar genim daye pêşiya mêrê xwe/Cûyê eş e/Heftekî din jî nayê ji eş e." Mela tekrara banga xwe berdewam dike: "Deriyê mala we bi ku vayeeeee!"

Jinik lê vedigerîne: "Seyda dîno, dilê min hov e mov e/Wê deriyê me bi aliyê ro(çem) ve/Wê mifta me bin gurzê çilo de yeeeeee!"

Mele banga xwe didomîne: "Kûçikê we heye an tuneyeeeee?"

Jinik dibêje: "Navê kûçikê min Beyaz e/Ji birçibûna di nav gund de dike kazekaz e."

Mele dawî li banga xwe tîne: "Eşhedû elah îlahe îlelah ve eşeden....."

Mele ji şabûna û lezbûnê li ser nimêjê xwe şaş dike, selamê rastê dide çepê, yê çepê dide rastê. Bi lezlez nimêjê diqedîne û berê xwe dide mala jinikê.

Jinik li malê 18 kîl savar daniye ber xwe ku bi destêr bihêre. Mele dibêje: "Xanim de zû rabe em destê xwe zû bigirin." Jinik dibêje: "Ka zû neke ka were em vî 18 kîl savarê bihêrin. Şev dirêj e û hemû ji me re ye." Mele jî bi jinikê re 18 kîlo savar dihêre. Tam li ser xilasbûnê, ji dengê wî kesê ku li derî dixwe, eşkere dibe ku, mêrê jinikê li derî dixwe. Mele dibêje: "Çi bikim, çi nekim." Jinik dibêje: "Xwe bixe afirê çêlekê."

Jinik derî vedike, ji mêrê xwe dibêje: "Mêrik mizginiya min ji te re çêleka me zaye." Mêrik dibêje: "Gelekî baş e. Wê demê em herin golika xwe bimêjin." Radibin mele tazî dikin û xwê di-



kin û davêjin ber çêlikê. Meleyê gewr ji tirsra dengê xwe nake. Dikin nakin çêlek nahêle ku ew gihanê wê bimije. Mêrik ji jina xwe dibêje: "Nexwe rûyê wî heye lewma nahêle ku bimije." Radibin rûyê mele ji binê ve kur dikin. Dîsa jî çêlek nahêle ku ew bimije. Mêrik dibêje: "Muheqeq ji ber diranê wî nahêle bimije." Radibin bi pensê hemû diranên wî ji hildikin. Lê belê hebek dernakeve û diran dişikê lê koka dirên dimîne. Ev jî pere nake. Jinik dibêje: "Dibe ku lingê wê dirêj in, were em lingê wî jî jêkin." Mêrik diçe ku birekeke bîne, jinik ji mele re dibêje: "Rabe bireve ew ê lingê te jî jêbibe." Mele radibe direve tê malê û ji jina xwe re dibêje: "Heta mehekê nehêle

kesek lingê xwe bi mala me bixe." Piştî mehekê mele dîsa radibe ser mînareyê berê xwe dide aliyê mala jinikê û dest bi bangê dike:

Allahû ekber Allahû ekberrrrrrr!" Jinik bersivê dide: "Heyrillah heyrillahhhhh!" Mele dom dike: "Erê delê dûv li bayê/ Te hijde kîlo savar bi min da hêryayê/ Helê dilê dil tirekê/ Qey ez golik bûm/ Te ez avêtim ber çêlekê." Jinik lê vedigerîne: "Ew mishefa di mala me de/ Ew dursa ku te xistibû devê kurê me de/ Eger pensa ku destê min de bûya/ Ew qota diranê teyê mabû/ Min ew jî bikişanda ji devê te de."

Berhevkar: RÊNAS LALEŞ

BI XELAT...

XAÇEPIRSA BI XELAT (118)

XAÇEPIRSA

4	A	M	A	Ş	X	Q	Y	D
E	D	P	K	A	R	A	H	A
I	T	A	N	A	L	S	T	
A	L	M	E	M	N	A		
A	R	N	A	B	Y	A		
A	R	E	X	N	E	G	I	R
E	M	Z	E	N				
A	R	A	R	A	T			
A	S	A	N	M	A			
O	L	I	C	A	R			

PEYVA VEŞARÎ → D I C L E F I R A T

Kesê di wêne de Rewşenbîr e/ê tirk	Xwînî Yekoyek	Dawera ziv Kurtenvîsa 'kilogram'e	Pirsgirêk Beşek ji mil	Hejmarek Tîpek dengdar	Gewimîn
				2	
Qazix Helbestva neki dema osmanî	7	Dawera Nîkelê Mesaj		Dûxan, Duman Tîpek	
		Mesleg Tîpek		Tîpek Avê divê	
Qertefa neyînîyê Bajarekî Almanyayê	4	Form Dendarên 'Nîr'		Nexweşiyek Tîpek dendar	3
		Dengdarên 'yek' Marê mezin		Koxka mîrîşkan Sedem	
Zêrze Rêxistinêk e saloxdayînê		Ked Tîpek dengdar	1	Denderek Lêborîn	
Gihaneke k Bere		Dawera Rodyumê Dawera 'iyotê'		Dawera 'hestin' Tîpek	
	6	Gelekî Mezopotam-yayê		5	


Bersiva Xaçepirsa 116'an

Xaçepirsa me bi xelat e. Di 15 rojan de çî bersiv bigihîjin destê me, emê wan binixûnîn û bi rîya pişkê li 5 kesan belav bikin. Xelata hejmara me ya 118'an Pirtûka Nejdê Buldan 'Yasaklı Topraklar'e.

Jêrenot:
Ji bo ku bersiva we bê nîrxandin, divê hûn "Peyva Veşarî" di nava qutiyên li bin xaçepirsa de binivîsin û tevî navnîşana xwe ji me re bişînin.

YASAKLI TOPRAKLAR

NEJDET BULDAN





Generalê tirk, leşkerên xwe yên ku mêjiyên gerîla davêjin ber kûçikan, ji poz û guhên mirovan tizbiyan çêdikin, wekî paqijtirîn û dilovantirîn leşkerên li ser rûyê cîhanê bi nav kir. Li hemberî van gotinan, biwêjê kurdî tê bîra mirov: "Berde, binê te erd'el"



WELAT
ROJNAMEYA HEFTEYÎ
(Haftalık Gazete)

■ Li ser navê
Gündem Basın ve
Yayınçılık
San. Tic. Ltd. Şti. (adına)
Xwedî (Sahibi)

SELAHATTİN DELİ

■ Yönetim Yeri
Çakırağa Mah. Sorguççu
Sk. No: 11/6
Tel: (0212) 530 01 40

■ Büroya İrtibatê
(İrtibat Bürosu)
Ayhan Işık Sk. No: 23/3
Beyoğlu/İSTANBUL
TEL: (0 212)
251 79 37-251 90 13
FAX: 251 95 85

■ Gerinendeyê Weşanê
(Yayın Yönetmeni)
SAMİ TAN

■ Berpirsê Karên
Nivîsaran
(Yazı İşleri Müdürü)
M. SALİH TAŞKESEN

■ ÇAPXANE
Yeni Asya Matbaacılık
A.Ş.

■ BELAVKIRIN
BIRYAY Dağıtım

■ NÜNERİTİYEN ME
(Temsilcilerimiz)

München:
(Nünerê Çapî yê Ewropayê)
Mahmut Gergerli
Tel: 49 871 672 29
Fax: 49 871 670 815

■ Brüksel:
Medeni Ferho
32 532 721 12 03

■ Swîre:
İhsan Kurt
Tel-fax
41 21 652 76 07

■ Bonn:
Ahmet Baraçkılıç
49 228 66 17 40

■ Hollanda:
S. A. Fewzi
31 104 85 55 43

■ Suriye:
Jana Seyda
Helim Yûsiv

Şerê lîmînî de rolê şarê tirk

Hemû kulturan de, mardan rê teva nêverazyeno. La belê kerdênê ke Antalya de xortanê şarê kurd virazyayan ro oyo ayseno no qaydewo, edet, tore û kulturê şarê tirk miyan ra vejyeno û beno vinî.

Ma bi xoyê tim û tim niwisan û qisanê xo de, birayîna şaran sero vindem û wazem mabenê şaran de lej û pêrodâyin mebo. Mabenê şaran de cayê lej û pêrodanî birayîn, embazîn û cîranîna rindîn bigiro. Qandê birayîn embazîn û cîranîna şaran, ma dest ra çîçiyoyeno, mayê kemi.

Çehar hezarî dewê ma, ya weşnay ya kerdî veng (tal), koy, bostanî, mêşey, rezî, bexçey, nêvatî bombey kerdî, keynan, wayan, mayan û cenîyanê ma rê tecawûz kerdî. Goş û zînciyê (pîrnîk) xortanê ma, birnay pa tîzbey viraştî. Xortê ma kîştî, kerdî letey letey û şetî kutikan ver. Kes şeno nînan bi kilmî wina biyaro zîwan, êkê amey şarê kurd ser, kesî ser niyamey. Û mayê bawer nekem jî, iyê bêrê zewbî şarî ser. Enê pêro dewleta tirk kerdî.

Ma ałaqayê şarê tirk enê kerdenan de çînyo? Bêguman esto. Her çîqas gîştê şarê tirk rast ra rast niyaysena jî, rastî de gîştê şarê tirk, enê hemû kerdenan de esta. Çimki şarê tirk hetanî nika bêveng mend û hewna jî, iyê bêvengîne xo ramenê. Şarê tirk çîqas bêveng mendî, dewleta tirk vardayîne xo hend kerdî vêşî.

Dewlata tirk jû kîşt (het) ra raya televizyon û rojnamana giranî dê, propogandaya psikolojik û kîştê bînan jî toximê faşîstin, barbarîn, şove-

karitê.

Rastî dewleta tirk, nê was-tenê xo kemiyanê roşnikar (roşnîvîr) û şêligê demokratê şarê tirk ser ardî ca. Belkî roşnikar û şêligê (kitle) demokratê şarê tirk, karê (girweyê) xo tayn bo jî, biyardayê ca, ne toximê faşîstîn barbarîn, şovenîstîn û mardimî mardimîn ra vetin Antalya de rûwayê û ne jî xeberê lîmin û qîlerînî Antalya ra ameyê.

Ze ke yeno zanayin, hemû dînan, edetan û kulturan de sûçê kesî, çîçî beno, wa bibo, mardan rê teva nêverazyeno. No qayde edetan, toran û kulturanê (çandê) hemû şaran de esto. La belê kerdênê ke Antalya de xortanê şarê kurd, gerilayê reyayîne şarê kurd û gîliyê çîmanê şarê kurd rê virazyayan ro oyo ayseno (vînyeno) no qaydewo, edet, tore û kulturê şarê tirk miyan ra vejyeno û beno vinî.

"Bewnê ezo tiya şarê tirk nûsena, çimki ek ma êkê Antalya de gîliyê çîmanê şarê kurd û gerilayanê reyayînan rê barbarîn kenê, înan şarê tirk ra mehesibnim jî, ê bînan ra vengo nêvejiyeno. Dewleta xora qeydeyê şerî û haqê mardimîn nêşilasena û goreyê qeydeyê şerî, ser nekêna, goreyê qeydeyê barbarîn şer kena. Co-



ka mayê dewlet ra teva nêvam, awa karê xo kena û wazena şarê kurd û şarê tirk pêfino (berdehev) û şarê kurd û şarê tirk dişmenê pêkiro.

Mayê bawer kemi şarê tirk nê karanê liminan û qîlerinanê dewleta xo, rojê ravey vînenê û zey ma qandê birayîn embazîn û cîranîna rindîna şaran vera dewlet yeno. Qandê şaran raya rind jî nawa û zewbî ray jî çîniya.

MEMED DREWŞ

Çîmdarîne ray HADEP şar o!

Ma nezdiyê 250 kesiya seba mehkamawa HADEP temaşekerdin û destek serok û serdaranê HADEP dayin şanê 27'ê aşm de, panc otobosana Amed ra hetê Enqerî ya kewtîm ray. Vaten ke ca de bo wesarî hemû weşîna xo ya marê embazîn kerd. Gama ke ma resay mi koyê qerecdaxî kesî vatê qayê koyê qerecdaxî zey veyva newî fîstano kewe (kîho) dabi xo ra û vilikanê xo yê kesk û sûr û zerdana ma rê dest şanayê. Ma verê çemê Feratî de vindertî û şamî werd. Şêligî ray de seba heqê nanî nêdê (medê) werê xo jî xoya ardîbi. Kutilkî, nanê tantûrî, apraxê dekerdey, pincar û zerzewat (sebze) tewran ra vejyay. Xora ehlaqê komelî şarî miyan de cayê xo giroto coka zek ma şîrê helefanî (pîknîk) ma şamê xo werd û çepikan, tîlîliyan û deyranan hetanî 20 km nezdiyê Enqerî şîmî, hetanî wîja qe astengî nêvejiya verniya ma.

La belê gama ke ma risay 20 km nezdiyê Enqerî seat hewta şewray (şodirî) de leşker û polîsan verniya otobosan girot. Hîris û panc otobosê ke Amed, Batman, Ruha, Adna, Îskenderun, Mersîn, Antalya û Konya ra ameybî pêro yew ca de risay pê. Polîsan dest na ruhsatê otobosan ser. Şêligî jî def û zîrna verde dest bi kaykerdin kerd.

Seat 12.00 de ma xeber girot ke; mehkama verde polîsan nezdiyê pansey endamê partî girotê zere (binçim). Na xeber peyra şêligî siloganî eştina, çalakiya ronîştin virasîna dewlet protesto kerd.

ROŞAN LEZGÎN

Ji Gündemê

Manşetên qedexekirî

Rêlibergirtinên
li ser *Ûlmede*
Gündemê dom
dikin.



27 avrêl 1998 duşem:

ÎFADE SENARYOYA MGK'Ê NE

Diyar bû ku, îfadeyên wekî yên Şemdin Sakik tîr ragihandin, perçeyek ji senaryoyên berê ye. Belgeyên ku di Rojnameya Demokrasiyê de hatin weşandin û senaryoya ku wekî îfadeya Sakik tîr ragihandin, li hev tîr. Wekî diyar e, di Rojnameya Demokrasiyê de belgeyên artêşê û Wezîrê Karên Hundurîn ên 'veşarî' hatibûn weşandin û navên sazî û kesên ku tîr hebûn, hatibûn pêşkêşkirin. Navên ku Şemdin Sakik dane heman nav in; ev yek jî di de xuyakirin ku, ev îfade li gorî senar-

yoyê hatine saz kirin. Di belgeyên 'veşarî', ku ji aliyê MGK'ê û Wezîrê Karên Hundurîn ve di sala 1997'an de ji kesên eleqedar re hatibûn şandin de, di hate xwestin ku kesên wekî 'cûdaxwaz' hatine destnîşankirin bîr berte-refkirin. Femandariya Kolorduya 6. ku yek ji wan e, di nivîsa xwe ya 'veşarî' de, navê Cengiz Çandar, M. Ali Birand, Komeleya Mafên Mirovan, Dayikên Şemiyê û çapemeniya muxalif dabû û raçavkirina (gözleme) van kes û saziyan xwestibû.

29 avrêl 1998 çarşem:

BI MILYONAN KES

TÊ DARIZANDIN

Di danîşina yekem a doza ku der barê rayedarên HADEP'ê de, bi hinceta "rêveberiya rêxistineke nehênî" hatibû vekirin de, Serokê Giştî Murat Bozlaş ragihand ku, ev doz ne hiqûqî ye, siyasî ye.

Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Bozlaş di danîşinê de, derheqê îdiayên "HADEP baska siyasî a PKK'ê ye" de, da zanîn ku, ew ji bo ramanên xwe yê şexsî û kiryarên xwe tîr tawanbarkirin. Her wiha Bozlaş got ku, bi darizandina HADEP'ê, bi milyonan kesên ku bi dil û can bi HADEP'ê re ne tîr darizandin.

Murat Bozlaş di parêznameya xwe de, bi bîr xist ku kêşeya bingehîn, kêşeya kurd e û ev kêşe tevahiya kêşeyan eleqedar dike. Bozlaş da zanîn ku, heta pîrsa kurdî çareser nebe, çareseriyê pîrsên heyî jî pêk nayê. Bozlaş wiha berdewam kir: "Ji bo ku em rastiyên li welêt tîr zimên, ji bo ku em dibêjin bi çek çareserî ne pêkan e û ji bo ku em çareseriyê aştiyane û demokratîk dixwazin, her dem bi standartên durû re rûbirû dimînin û pest, kotekî û qetlîam dibin para me."

Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Bozlaş da zanîn ku, piştî rapora MGK'ê derket holê ku, rêjeya dengên HADEP'ê roj bi roj berz dibe, lewre jî biryara pasîfîzekirina partiyê hatiye girtin. Bozlaş diyar kir ku, piştî vê raporê kampanyayên li dijî wan roj bi roj zêde bûne û li dijî van dozan û pêşeroja Tirkîyeyê barê giran dikeve ser milên dozgeran.

LI DIJÎ KOMPLOYA SAKIK REAKSIYONÊN TÛJ

Dewlet û medyaya wê, li gorî qaşo îfadeya Şemdin Sakik li dijî saziyên muxalîf xebatên komployî kirin, lê ev komplo bûn sedema reaksiyonên tûj ên van saziyan. IHD, TIHV, ÖDP û EMEP'ê diyar kirin ku, ev komplo kesên aşîxwaz û mafparêz hedef digire û gotin ew ê piştigiriya van sazî û kesên bikin.

Van saziyan ragihandin ku, ev îdiayên ku dibêjin ên Sakik in, îdiayên ku heta îro di belgeyên dewlet û MGK'ê de cih girtine. Her wiha saziyan gotin ku, ew dest ji parastina mafên mirovan,

ked û aşiyê bernadin. Serokê IHD'ya Stenbolê Kanar jî got, ew ê serî li darêzgeriyê (yargî) bidin.

Ji rojnameya Sabahê nivîskar-rojnameger Mehmet Ali Birand, ku derkele bîhnedana ji mecbûrî jî got, ji bo ku îdiayên derheqê wî de bide pîrsiyarkirin, wê serî li DGM'ê bide. Serkanê Giştî yê Artêşa Tirk yê berê Doğan Güreş jî diyar kir ku, baweriyê wî bi van îdiayên ku dibêjin yê Şemdin Sakik in, nayê.

30 avrêl 1998 pêncşem:


NEPOXA 'CINAYETA PALME' TEQIYA

Nûçeyên 'Palme ji aliyê PKK'ê ve hate kuştin' ku wekî îfadeya Şemdin Sakik tîr îlankirin ji aliyê rayedarên Swêdê ve şayanî lêpîrsinê nehate dîtin. Serdozger Riberdahl, di gotareke xwe ya di rojnameyê Swêdê de, daxuyand ku hin agahiyên Tirkîyeyê berê jî dabûn, pûç derketin. Mudûrê Polisên Sûcdaran yê Swêdê Lars Nylen, daxuyaniyek da Ajansa Reuter. Nylen di daxuyaniya xwe de got, ev îdia dubarekirina îdiayên berê ne. Her wiha Nylen ragihandin ku, wê îdianameyê di demêke nêzik de bibin dadgeha bilind û derheqê kiryar Christer Petersson de qerar bê dayin.

Hate ragihandin ku rayedarên swêdî li ser vexwendina Tirkîyeyê berê 3-4 caran çûne Girtîgeha Amedê û bi îftîrafkarên cinayetê re hev dîtin pêk anîne. Lê ji van hev dîtinên ku rayedarên bîrîrafkarên re kirine de, encameke zelal derneketiye û ji ber vê yekê dosyaya der heqê kurdan de hatiye girtin.

Jİ ERNK'Ê JI BO PROVAKASYONÊ HIŞYARNAMEYÊK

Nûnertiya ERNK'ê ya Swêdê der heqê îdiayan de daxuyaniya da û diyar kir, ev senaryo ji aliyê dewleta tirk ve hatiye amadekirin. Di daxuyaniyê de wiha hate gotin: "Tu tîkiliya PKK'ê bi qetilkirina Olof Palme re tune ye. Tawanbarkirinên qirêj ên bi salan tîr kirin, derew derketin."



Serokê Giştî yê HADEP'ê Murat Bozlaş di danîşina xwe ya 28'ê avrêlê de got ku bi darizandina HADEP'ê bi milyonan kes tîr darizandin